Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ | SAL: 1 HEJMAR: 33–34 | 9 TÎRMEH 1995 | BUHA: 40.000 TL(KDVD)

Endamên HADEP'a Bağcılara Stenbolê, li mala xwe tirkî qedexe kirin. Xwendevanino, hûn ji bo kampanyayê çi dikin?

'Serê gelê kurd û tirk sax be'

Îro dewlet ne li Kurdistanê, ne jî li Tirkiyeyê kesên demokrat, şoreşger û welatparêz dixwaze. Li dîjî wan fen û fotan dike. Ma qey mirov bi kuştina yeko yeko tu car xelas dibe? Na!.. Dewlet ji bo bitirsîne, biperçiqîne; tehdît dike, nebe dikuje. Heta vê gavê bi vî awayî bi dehhezaran kes winda bûne û hatine kuştin.

Rûpel 7

De gidî mişko, ha gidî mişko

Heke tiştekî jahrîn li nava kanalizasyonê bê danîn, di nava çend saetan de ev nûçe li nav mişkan belav dibe û mişkek jî nêzî wê jahriyê nabe. Dema Kuriskarên seretayî dihatin bikaranîn, mişkan bi tenê genekî nû ji bo liberxwedanê diafirandin. Niha zanyar dibêjin ku mişk ji bo xweparastinê xwediyê navgînên têkûztir in.

Rûpel 16

Li benda mirinê

Koma Xanî ya Çand û Wêjeyê, encama pêşbaziya kurteçîrokan di 3'yê tîrmehê de li Helebê diyar kir. Ji nav 26 kurteçîrokan xelata yekemîn, kurteçîroka "Li Benda Mirinê" ya Suud Kılıç stand. Xelata duwemîn Fewaz Ebdî bi kurteçîroka "Çira Pêncan" û ya sêyemîn jî M. Hemo bi berhema xwe ya bi navê "Hestir" stand.

Rûpel 12–13

İHD: Li Tirkiyeyê mirin erzan e

Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan (İHD) Akın Birdal, rapora meha avrêl û gulanê bi civînekê daxuyand. Ev meh bi binçavkirin, îşkence, cinayetên faîlî meçhûl, windakirinên di binçav de û bi pêkûtiyên li ser saziyên demokratîk û çapemeniyê derbas bûne.

Rûpel 4

NÇM li hemberî êrîşên dewletê, ji bo daxwaza piştgiriyê têkilî bi konsolosên biyan re danîn. Konsolosê Avûsturyayê ji Berpirsa NÇM'ê Nuray Şen re wiha got:

'Wê ev şer li ser maseyê bê çareserkirin'

● Ji serê demekê û bi vir ve NÇM (Navenda Çanda Mezopotamya) bûye hedefa dewletê. NÇM, ji roja ku hatiye avakirin û heta niha gelek carî rastî êrîşên dewletê bûye. Lê vê carê dewlet bi niyeteke din bi ser wê de diçe û dixwaze wê bigire. Di 7'ê pûşperê de şaxê izmirê hate girtin û di 23, 24'ê pûşper û 3'ê fîrmehê de jî polîsên emniyetê girtin ser şaxê Edeneyê.

● "Navê vî şerî teror an jî tiştekî din, ew ne ewqas muhîm e û wê rojekê li ser maseyê bê çareserkirin. Lê kultura gelekî hergav heye û wê bi hezar salan jî dewam bike. Ji bo vê yekê em bi awayekî dostane dixwazin têkiliyê bi we re deynin. Hurmeta me ji gelê we re heye û em hêvî dikin hûnê di warê çand û hunerê de gelek pêşketinên nû çêbikin."

Rûpel 2



Bi Serokê HADEP'a Stenbolê Kemal Parlak re sohbeteke pireng

'Divê tevgerên aştîxwaz berfireh bibin'

● Dewlet, wekî partiya PKK'ê dixwazê me bide nîşandan. Lê heta ji me bê, em destûrê nadin vê niyaza dewletê. Erkên rewşenbîr û demokratan jî hene. Divêt tevgerên aştîxwazane bêne berfirehkirin. Serê 6 heyvan e ku ez di vî warî de bi rewşenbîran re dixebitim.

● Divêt bête zanîn ku êdî, em ne di salên 1968–1975'an de ne. Mirovên salên 1995'an, ramana xwe guhertine, daxwazên wan cudan e. Lewra pêdivî ye yên kadro jî li dûv van daxwazan be. Heger, yeksaneyeke bi vî rengî neyê peydakirin ev kar bi rê ve naçe.

● Ez li nexweşxaneyê bi hinek nexweşan re bi kurdî (zazakî) dipeyivim. Wekî kes, ez dikarim vê yekê bibêjim ku di vî warî de sûcê me zêde ye û gunehê me pir e.

● Bi rastî jî zaza hişk in. Gava ku hûn li bizavên kurdan yên herî mezin dinêrin (Şêx Seîd, Seyid Riza) her zaza têne dîtin. Lê wekî şexs ez xwedî mîzaceke nerm im.

Rûpel 8–9

Li welatê xerîbiyê kurdîtiya bêkurdî

● Stenbol jî di nav de, gelek bajarên Tirkiyeyê ji aliyê kurdan ve hatine fetihkirin. Di çavê kurdan de gava yek ji gund û bajarê xwe bi dûr dikeve, ew cihê ku diçe, jê re dibe welatê xerîbiyê. Her çiqas kurd bi çavê wisa li Stenbolê nenêrin jî, ev der gelek caran ji kurdan re bûye welatê xerîbiyê. Li welatê xerîbiyê bi dehan saziyên kurdan hene û ji bo siyaset, kultur û edetên kurdan dixebitin. Lê heta vê gavê jî ziman, bi piranî tirkî ye.

● Me beşek ji nivîsa xwe ya bi sernavê "Alo rojbaş, burası.." di hefteya derbasbûyî de weşand. Vê hefteyê jî beşê dawîn diweşînin û bê şîrove em çavdêriyan ji devê saziyan didin. Nirxandin jî ji we xwendevanan re dimîne.

Rûpel 11



www.sivakurdi.org

NÇM li hemberî êrîşên dewletê, ji bo daxwaza piştgiriyê têkilî bi konsolosên biyan re danîn. Konsolosê Avûsturyayê ji Berpirsa NÇM'ê Nuray Şen re wiha got:

'Wê ev şer li ser maseyê bê çareserkirin'

"Navê vî şerî teror an jî tiştekî din, ew ne ewqas muhîm e. Ewê rojekê li ser maseyê bê çareserkirin. Lê kultura gelekî hergav heye û wê bi hezar salan jî dewam bike. Ji bo vê yekê em bi awayekî dostane dixwazin têkiliyê bi we re deynin. Hurmeta me ji gelê we re heye û em hêvî dikin hûnê di warê çand û hunerê de gelek pêşketinên nû çêbikin."

Ji serê demekê û bi vir ve NÇM (Navenda Çanda Mezopotamyayê) bûye hedefa dewletê. NÇM, ji roja ku hatiye avakirin û heta niha gelek carî rastî êrîşên dewletê bûye. Lê vê carê dewlet bi niyeteke din bi ser wê de diçe û dixwaze wê bigire.

Polîs dest bi êrîşa dike

Polîsên emniyeta Îzmîrê, di 7'ê pûşperê (hezîran) de girtin ser şaxê NÇM'ê, gelek kes binçavkirin û navend mohir kirin, bi gotineke din girtin. Dadgeha Ewlehiya Dewletê ya Îzmirê (iDGM), ji bo girtina bi temamî, der heqê NÇM'ê de doz vekir. Di 23–24'ê pûşperê de li bajarekî din, li Edeneyê polîsên emniyetê avêtin ser şaxê NÇM'ê. Dîsa gelek kes hatin binçavkirin. Li gorî agahiyan, di 3'yê tîrmehê de jî polîsên emniyetê girtine ser NÇM'ya Edeneyê û xebatkarên wê bi mirinê tehdît kirine. Ji hêla din ve 29'ê pûşperê de li Beykozê, hozanê NÇM'ê Ganî Nar, ji aliyê polîsên sivîl ve hate binçavkirin û dû re ji bo mehkemekirinê ew şandin girtîgeha Konyayê.

Li hemberî kirinên hêzên dewletê NÇM'ê, têkiliyên bi konsolosên dewletên biyan re jî di nav de, dest bi gelek faaliyetan kirin. Li navçeya Bakirköy (Stenbol), Meydana Azadiyê kirinên dewletê hate protestokirin û ji bo çapemeniyê daxuyaniyek hate xwendin. Dîsa li Beyoğlu û li Îzmîrê bi livbazî û konseran, pêkutiya dewletê hate protestokirin.

NÇM bi konsolosan re têkiliyê datîne

Li milê din, wekî li jor jî hate gotin, NÇM'ê bi konsolosên dewletên biyan re têkilî danîn. Têkiliya ewilî, di 11'ê pûşperê de bi konsolosê Avusturya Dr. Ervîn Lucius re hate danîn. Di hevdîtinê de li ser navê NÇM'ê Nuray Şen û li ser navê Enstîtuya Kurdî Mehmei Şafî Ekinci, beşdar bûn. Derbarê vê hevdîtinê de Nuray Şen ji rojnameya me re ev got: Di hevdîtinê de me qala armanca NÇM'ê kir û me bala wî kişand ser pêkutiyên dewletê yên li ser me. Li wir me alîkariya navnetewayî xwest. Ji hêla din, di vê hevdîtinê de me fikrên xwe yên derbarê xebata demokratîk û yên li ser rewşa xebata kultura kurdî, ji wan re got. Hevdîtina me bi awayekî dostane domiya. Konsolos Dr. Ervin Lucius ji me re got ku ew rewşa gelê kurd a ku di nav de dijî, dizanin û li hemberî vê meseleyê pir hesas in. Li hêla din, der barê şer fikrên xwe wiha diyar kir, "Navê vî şerê teror, an jî tiştekî din, ew ne ewqas muhîm e û wê rojekê li ser maseyê bê çareserkirin. Lê kultura gelekî (xelkekî) hergav heye û wê bi hezar salan jî dewam bike. Ji bo vê yekê em bi awayekî dostane dixwazin têkiliyê bi we re deynin. Hurmeta me ji gelê we re heye û em hêvî dikin hûnê di warê çand û hunerê de gelek pêşketinên nû çêbikin. Haya me ji pêkutiyên ku li ser we çêdibin û tengasiyên ku derdikevin pêş we jî heye, lê em tênagihên û ji ber vê yekê em van kirinan qebûl nakin. Ev agahdariyên ku we dane me, emê pêşkêşî hikûmeta xwe bikin. Emê hemû saziyên ku bi van tiştan eleqeder dibin, agahdar bikin. Heger ku hûn me dewet bikin, em jî dixwazin beşdarî faaliyet û çalakiyên we bibin".

"Hûn zanibin ku em bi we re ne"

Ji hêla din NÇM û Enstîtuya Kurd, di 22'ê pûşperê de Konsolosiya Swêdê ziyaret kirin. Di vê ziyaretê de hevdîtin bi konsol Bengt Knutsson hate çêkirin. Li ser vê hevdîtinê jî Nuray Şen ev got: Me ji wan re qala armanca avakirina NÇM'ê kir. Di hevdîtinê de me got ku navenda me dixwaze mîrasa gelên Mezopotamiyayî (kurd, keldan, asûr, ermen û hwd.) derxîne holê. Helbet pêkutiyên dewletê û astengiyên ku li pêşiya me tên derketin jî, di hevdîtinê de hate gotin. Konsul Bengt Knutsson jî, li hemberî van gotinên me fikrên xwe anîn zimên. Wî got: "Haya me ji van probleman heye. Hatina we ya vir ji bo me pir muhîm e. Em qîmeteke mezin didin çand û hunera gelan." Di vê navbeynê de me ji wan xwest ku ew van agahiyên me bigihînin hikûmeta xwe jî. Ev daxwaza me ji aliyên wan ve hate qebûlkirin. Di dawiya hevdîtinê de konsul ji me re ev got: "Em dixwazin hûn zanibin ku em bi we re ne."

Nameya NÇM'ê ji konsolosiya Amerîka re

Helbet xebata NÇM'ê û Enstîtuya Kurdî bi van têkiliyan naqede. Ji ber ku wan ji me re gotin ku wan ji konsolosê Amerîkayê re jî nameyek bi wasiteya Komeleya Mafên Mirovan (İHD) şandiye û di wê nameyê de qala rewşa xwe kiriye. Li gorî gotina Nuray Şen, ew hêvî dikin ku di demeke nêzîk de bi berpirsiyarekî Konsolosiya Amerikayê re jî hevdîtinekê çêbikin.

Li ser pirsa me, Nuray Şen der barê têkiliyên din jî ev agahî dan: Emê van ziyaretên xwe bi awayekî perîdoyik bidomînin. Em ferqê naxin nav tu dewletan û em dixwazin bi hemû konsolosên dewletan re têkiliyê deynin. Ji ber ku tatîla havînî kete ber, herkes li welatê xwe ye. Têkiliya me ya ewilî, wê bi Konsolosiya Norvêç û Belçîkayê re çêbibe. Ewê li me bigerin û randevuyê ji me bixwazin. Heta ji bo vê rewşa tatîlê, wan lêborîna xwe jî ji me xwest.

Hevala Nuray Şen, sebeba van têkiliyan, bi vî awayî şirove kir: "Bi fikra me wê '95, bibe sala çareseriyê, bi gotineke din saleke pir muhîm. Lê Komara Tirkiyeyê (KT), bi awayekî din nêzîkî meseleyê dibe û bersiva hewldanên ji bo çareseriya siyasî, bi girtin û pêkutiyan dide. Bi van kirinên xwe jî dide zanîn ku ew aştiyê naxwaze. Halbukî em saziyek demokratîk û kulturî ne.

Hozan Ganî Nar

Bêhna kurdîtiyê ji çi tê, dewlet êrîşî wir dike û tehamûlî van tiştan nake. Emê heta dawîn, di ber xwe de bidin û nirxên xwe biparêzin. Li vir em dixwazin bangî gelê tirk bikin, lê ji bilî hin hewldanên şexsî û yên saziyan, me dît û em dibînin ku me nabihîsin. Ji bo vê yekê em jî destek û alîkariya rayagiştî ya navneteweyî dixwazin û ji bo vê destekê dixebitin. Bila bê zanîn ku em ji mecbûrî dest davêjin vî tiştî."

Navenda Nûçeyan

Kongreya dostanî ya kurd û yûgoslavî

Di 5'ê tîrmeha 1995'an, katjimêr 19'oo, Kongreya yekemîn ya komeleya dostaniyê ya Kurdistanî–Yugoslaviyan hat lidarxistin û li ser wê bingehê komele bi awayekî fermî hat damezirandin.

Bi gotineke balkêş ji aliyê seroka komeleyê ve kongreyê dest bi karê xwe kir û rewşa gelê Kurdistanê bi firehî hat berçavkirin.

Dû re ji aliyê Dr. Goran Botanî ve bi firehî li ser Dîroka Kurdistanê û liberxwedan û têkoşîna hemdem rawestiya û şoreşa gelê kurdistanê bi rêveberiya Partiya Karkerên Kurdistanê anî ziman. Li pey vê yekê, serokê komeleya dostaniyê ya Kanada–Yugoslavyayê gotinek xwend û desteka xwe ji bo liberxwedana gelê Kurdistan diyar kir.

Mesajên pîrozbahiyê yên hatin xwendin ev bûn:

–Mesaja ERNK'ê (komîteya balkanan).

–Komela dostaniyê û hevalbendiyê (Bulgaristan–Kurdistan)

–Mesaja wênevanê bi nav û dengê Yugoslavyayê Miliç Odmaçê

Li dawiya kongreyê programa komelê hat xwendin û li ser hat dengdan.

Di vê civînê de nêzîkî 100 kesî amade bûn, tev hejmarek ji nûnerên televizyon, radyo, rojnameyan

–Mêvanê kongreyê kesên cur bi cur bûn, wekî profesar akademisyen, doktor, dîrokzan û hwd.

–Komele û rêxistinên amadeyî kongreyê bûn;

1–Endamê komiteya navendî ya sosyalîstên sirbiyan (SP).

2–Wezareta karê derve.

3–Komîteya leşkerên yugoslavî, beşê informasyonê.

4–Wezareta informasyonê

5–Komela dostaniyê ya cihûyên sirbî

6–Komela dostaniyê ya Kanada–Yugoslavyayê.

Belgrad/Welatê Me

Hostayê mîzahê Aziz Nesin li gorî wesiyeta xwe wê li hewşa weqfa ku wî ava kiriye, bê veşartin.

Aziz Nesin jî mir

Nivîskarê tirk yê mîzahê Aziz Nesin, di 6'ê tîrmehê de li navçeya Çeşmeyê ya İzmirê, ji ber krîza dil mir. Aziz Nesin, di sala 1915'an de li Stenbolê hate dinyayê. Di jiyana xwe de li hemberî kirinên hikûmetan derket û wekî rewşenbîrekî mucadele kir. Di 80 salî de 90 kitêb nivîsandin û mohra xwe li edebiyata tirk xist.

JÛJÎ

Doğan Güzel

Fîlmekî kevnenû: Derbe tê haa!

"Em di bin emra desthilata siyasî de ne, lê belê encama xala 8'an a qanûna li dijî terorê wê tesîrê li me bike. Ji ber vê yekê vê gavê em dixwazin ku ev xal (made) wek xwe bimîne, guherandina wê ne li cih e. Demokrasî û mafên mirovan dest û pê li me girêdidin. Eger ne ji wan bûya, me dikaribû ev pirsgirêk zûtir çareser bikira."

Roja 30'ê pûşperê, dema Serokê 2'yemîn yê Lijneya Giştî ya Artêşa Tirk Ahmet Çörekçi ev hevokên li jor di birîfîngekê de anîn zimên, ji nîşka ve rojeva Tirkiyeyê guherî. Çapemeniya tirk mîna bombeyeke pir bi tesîr, ev gotin pêşkêşî raya giştî kir. Li hemberî van guherînan general Çörekçi, hem çapemeniya tirk, hem partiyên siyasî, hem jî şexsiyetên siyesî di nava xwe de bûn du alî.

Aliyek ji wan destek da gotinên Çörekçi, aliyê din jî dijberiya xwe anî zimên. Rojnameya Hürriyet, Milliyetê, ji xeynî serokê parlementoyê Hüsametin Cindoruk hemû rayedarên DYP'ê, ANAP û RP'ê piştgirî dan Çörekçi. Rojnameyên Sabah, Yeniyüzy Cumhuriyet, CHP û YDH'ê jî li dijî Çörekçî peyivîn û diyar kirin ku mafê wî tune daxuyaniyên siyasî bide.

Tevî van tewrên wan ên cihêreng jî, bi giştî hemûyan mesajek dida raya giştî: "Eger em artêşê hinekî din aciz bikin, an jî eger em tedbîran nestînin, wê di demeke pir nêzîk de derbeyeke leşkerî çêbibe." Yên piştgirî didan gotinên Çörekçi û bal dikişandin ser îhtimala derbeyekê, wek çare jî kêmkirina demokrasiyê nîşan didan.

Li gorî wan, li Tirkiyeyê demokrasî hingî zehf e ku artêşa tirk nikare xwe bilebitîne û bi terorê re mucedeleyê bike. Ji ber vê yekê eger gel hinek ji demokrasiyê feragat neke, wê general zehf hêrs bibin û dest daynin ser îktidarê.

Yên li dijî gotinên Çörekçi derdiketin jî artêşa tirk wek saziyeke demokrat nîşan didan, wek çare jî teqewitkirina Çörekçi û yên wek wî pêwist didîtin. Çawa ku arteşa tirk beriya Çörekçi pir demokratîk bû û Çörekçi ew ji demokrasiyê dûr dixist (!)

ANALÎZ

Gelo Çörekçi çi gotibû, bi serê xwe hareket kiribû, yên rexne lê dikirin artêşa tirk nas nedikirin, îhtîmala derbeyekê çiqas hebû ku herkesî sinyala darbeyekê dida?

Îro, bi awayekî fîîlî her tişt di dest artêşa tirk de ye. Îspata wê jî bi kurtî ev e; 1) % 45 butçeya Tirkiyeyê ji bo mesrefên leşkerî tê veqetandin. Li tu sîstema diktatorî jî kes rastî rêjeyeke ew çend bilind nehatiye. 2) Artêşa tirk her qerara xwe bi meclîsê dide qebûlkirin, heta niha yek tenê jî ji meclîsê bi îtiraz venegeriyaye. Gelek qeraran jî beriya meclîsê distînin, mesela operesyonên leşkerî. Ji ber vê yekê niha li Kurdistanê ji xwe gerîna awarte heye û li Tirkiyeyê jî şertên derbeyeke adetî ji ber sebebên li jor, nîn in. Yanî ger derbeyeke nermî çêbibe, artêş ji vê gavê zehftir avantajên xwe nikare zedetir bike û bi ser nakeve.

Wê çaxê çima Çörekçi wisa peyivî û çima herkesî sinyala darbeyê da.? Diyar e ku banga Çörekçi rasterast tehdîda derbeyê bû.

Dewletê xwest ku bi riya çapemeniyê rengê vê tehdîdê cidî bide xuyakirin. Tevî vê yekê, tesîra wê zêde dewam nekir, ji ber ku ew tehdîdeke pûç û encama senaryoya navbera artêş, çapeminî û partiyên siyasî yên tirk bû.

Armanc; tirsandina gel û nermkirina reaksiyonên raya giştî yên li dijî neheqiyên dewletê bû.

Armanc; xurtnişandana artêşê bû.

Armanc; bi rojeveke sunî meşgûlkirina raya giştî bû.

Yanê ew tehdideke vala, bi gotineke din blofeke li dijî gel bû. Gel li hemberî vê blofê got: "Me resta we dît."

M. ROJAVA

Ahmet Çörekçi

Süleyman Demirel

Cem Boyner

...KURTENÛÇE...

YEK-KOM û protestoyên cihêreng

Yekîtiya Komeleyên Kurd li Almanyayê (YEK-KOM), di 4'ê tîrmehê de ji bo hefteyekê biryara girtina hemû komeleyên ku bi wê ve girêdayîne, stand. Ev biryar, ji ber siyaseta dewleta alman a ku li hemberî sazî û komeleyên kurdan bi awayekî nebaş pêk tîne, hate wergirtin. Li hêla din li ber komeleya Bonnê, Wiesbaden û Berlinê grevên birçîbûnê jî dest pê kirin.

Mudeta agirbesê dirêj bû

Li Başûrê Kurdistanê, agirbesa ku di navbera her du hêzên sereke (PDK-YNK), di meha avrêlê (nîsanê) de hatibû îlankirin, ji bo mehekê dîsa hate dirêjkirin. Li gorî agahiyan, serokê PDK'ê Mesûd Barzanî û Serokê YNK'ê Celal Talabanî, bi wasiteya Îranê gihîştin vê encamê. Wek tê zanîn biryara agirbesê ji aliyê PDK'ê ve hatibû standin, wê di 15'ê tîrmehê de biqediya.

Cemiyeta rojnamevanên Kurdistanê

Di bernameya rojnamevan Günay Aslan "Kaniya politika" de, meseleya "Rojnamevaniya Kurd a li Derve" hate peyivandin. Di vê bernameyê de, bi gelek rojnamevan û rojnameyên kurd ên li derve re, der barê rewşa wan û avakirina Cemiyeta Rojnamevaniya Kurdistanê de hate axaftin piraniya beşdaran li ser avakirina vê saziyê hemfikir bûn.

ERNK û bêçariya Komara Tirkiyeyê

Nûneriya ERNK'a Balkanan, di 5'ê tîrmehê de daxuyaniyek weşand. Di daxuyaniyê de hate gotin ku di van rojên dawîn de Komara Tirkiyeyê, li hundur ji ber têkçûna li hemberî gerîlayan, dixwaze bêçarî û kerba xwe ji serê dewletên cîran derxîne. Wekî tê zanîn çend mebûsên yewnanî, ji bo hevdîtinê, çûbûn cem Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan. Wê serdana rika dewleta tirk kişandibû ser vî welatî.

Beşikçi wê 203 salan razê!

Nivîskar İsmail Beşikçi, ji ber kitêba xwe ya nû, "Qedexeyên Bêkêr" 2 sal ceza û 550 milyon cezayê pereyan xwar. Cezayên Beşikçi, bi yên nû gihîştin 39 sal cezayê hepsê û 3 milyar û 734 milyon cezayê pereyan. Beşikçi ku cezayê pereyan nede, wê cezayê hepsê ji 39 salan derkeve 203 salan.

www.kurdistan.org

Navê **5** kesên ku di xaçepirsa hejmara 31'an de peyva veşarî **'Hêvîdarî'** dîtine û pirtûka **"Evîna Cemîlê"** ya Cengiz Aytmatov qezenc kirine

Hüseyîn Idığ Yozgat

Zekî Bazidî Stenbol

Hüseyîn Turan Adıyaman

I. Oktay Enqere

Hamdullah Uçar Qoser

Bîlançoya şer û îhlala mafên mirovan a avrêl û gulana 1995'an: 795 mirî

Rapora İHD'ê: Li Tirkiyê mirin erzan e

Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan (İHD) Akın Birdal, rapora binpêkirina mafên mirovan a meha avrêl û gulanê bi civînekê daxuyand. Li gorî raporê, meha avrêl û gulanê bi binçavkirin, îşkence, cinayetên faîlî meçhûl, windakirina di binçav de û bi pêkûtiyên li ser saziyên demokratîk û çapemeniyê derbas bûye.

Rapora İHD'ê, ji aliyê serokê komeleyê Akın Birdal ve ji çapemeniyê re hate daxuyandin. Birdal di daxuyaniyê de li ser pêkûtiyên ku li xebatkarên komelyê dibin û binçavkirina sekreterê şûbeya Dersime, serokê şubeya Edeneyê û serokê şûbeya Bursayê sekinî û agahî dan. Akın Birdal, qala derxistina ji Tirkiyeyê ya Nûnerê Rêxistina Efûyê Helmut Oberdiek kir û pişt re jî,

li ser skandala hevdîtina Wezîrê Karê Navxweyî Nahit Menteşe sekinî. Birdal der barê Nûnerê Helsinki Watch Cristopher Panico de agahî dan û got ku Tirkiye bi van yekan peymanên navneteweyî yên ku îmze kirine, îhlal dike. Birdal, li ser tehdîdên Mudirê Emniyeta Stenbolê Necdet Menzir jî wiha got: "Me der barê Menzir de berê jî banga sûc kiribû. Gava edalet bixebitiya, karmendekî dewletê nikarîbû tehdîdên wiha bikira. Di vê bûyerê de Menzir ne muhîm e, tiştê girîng hêzên ku piştgiriyê didin Menzir in."

Li ser guherandina Qanûna Bingehîn jî Birdal got ku divêt Qanûna Bingehîn bi temamî biguhere û xalên antî-demokratîk jê bên derxistin.

Îhlalên mafên mirovan ên meha avrêl û gulanê.

Înfazên bêdarizandin, di binçav de mirinên bi îşkenceyê: 20
Cinayetên faîlî meçhûl:14
Îdiayên îşkenceyê:26
Îdiayên windabûnê: 26
Kesên hatin binçavkirin: 1443
Sûcdarên fikrê yên di girtîgehan de: 157
Cezayên heps û pere yên ku hate dayîn: 66 sal û 2 meh hefs, 6 milyar û 186 milyon pere
Cezayên ku hate xwestin: 500 sal û 500 milyon
Weşanên ku hatin berhevkirin : 50

Serokê İHD'ê Akın Birdal

Rojnamevanên ku hatinbinçavkirin: 75
Sendîka, weşan û komeleyên ku bi ser ve hate girtin: 20
Deverên ku hatin bombekirin: 22
Gundên ku hatin valakirin û şewitandin: 29
Livbaziyên li dijî sivîlan: 44
Sendîka, komele û weşanên ku hatin girtin: 8
Kesên hatin tewqîfkirin: 193
Kesên di lihevxistinan de mirin: 719

Navenda Nûçeyan

XAÇEPIRSA BIXELAT (31)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 33'an; pirtûka **John Steinbeck " Mişk û Mirov"** ye. Ev pirtûk ji aliyê Weşanên Nûdemê ve hatiye çapkirin.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Xelata Xaçepirsê



"Mişk û Mirov"
John Steinbeck

XAÇEPIRSA BIXELAT (33)



PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8 9

Al: Li dinyayê binpêkirina mafên mirovan

Roja 5'ê tîrmehê Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Al) rapora xwe ya sala 1994'an daxuyand. Li gorî raporê li seranserî cîhanê rêjeya binpêkirina mafên mirovan zêde bûye. Tê gotin ku ji kirinên bi rengî herî zehf jin û zarokan ziyan dîtiye. Ji sedî 80'yê penaberên li ser rûyê erdê jin û zarok in. Rapor wekî bûyera herî xedar a sala 1994'an tevkujiya Rwandayê destnîşan dike. Li gorî raporê bi hindikayî hezar kes li 34 welatan bi îşkenceyan di binçav de hatine kuştin. Dîsa rapor dibêje ku zêdetirî hezar kesî bi destê sîxurên dewletê hatine windakirin û nêzî 2500 kes jî hatine înfazkirin. Tê gotin ku bi taybetî jin rastî êrîşên hovane û tecawûzê tên. Li gorî raporê ew tişt bi destê hêzên dewletan pêk tê. Rapor dide zanîn ku li hinek welatan bi destê mêran jî jin têne kuştin. Rêxistina Efûyê ango Amnesty International (Al) dide zanîn ku li 151 welatî bi şêweyên cur bi cur mafên mirovan tên îxlalkirin.

Rapor dibêje: "Hikûmetan mirov ji ber derbirina bîr û baweriyên xwe xistine pişt deriyên hesin, îşkence li mirovan kirine ji bo ku ew li xwe mukur bên. Dîsa ji bo bêdengkirina dijberên xwe, wan metodên wekî îşkence, windakirin, kuştinên bêdarizandin bi kar anîne."

Rapor dide zanîn ku li welatên Ewrûpayê rayedarên dewletê zilmê li mirovên biyan û penaber dikin. Li gorî raporê polîsên amerîkî jî bi awayekî nebaş li hemberî mirovên di binçav de tevger dikin. Rapor rexneyan li rêxistinên dijber jî digire. Di raporê de rexneyên ku li partiyên Kurdistana Federal hatine girtin jî balê dikişîne ser xwe.

Nûçeyên Derve

'Serxweşek' û daxwaza aştiyê

Dema ku Yeltsin di civîna giregirên 7 dewlemendên dinyayê de ji bo bidestxistina alîkariyê keftûleft dikir, nûçeya cerda çekdarên çeçen a li ser nexweşxaneyeke Budennovskê, hat. Ew bûyer bû sedem ku şerê çeçenan di civînê de bi awayekî din bê gengeşi kirin. Piştî civînê giregirên dewlemendên dinyayê ji Yeltsin xwestin ku vî şerî bi riya siyasî çareser bike. Dema hemû êrîşên polîsên taybet ên li ser nexweşxaneyê (ji bo rizgarkirina hezar mirovên dîl) têk çûn Serokwezîr Viktor Chernomyrdin naçarbû ku bi çekdaran re li hev bê.

Li hemberî êrîşên polîsan kesên dîl digotin: "Agir bibirin, hûn me dikujin, çeçen tu zirarê nadin me. Ew pariyê xwe yê dawîn didin me." Li gorî çavdêran gelê rûs li hemberî helwesta rayedarên xwe sekiniye û ji wan lihevkirin xwestiye. Rojnameya Izvestiyayê ku wekî rojnameya herî mezin tê nirxandin, bûyer bi vî sernavî pêşkêşî xwendevanên xwe dikir: "Em hemû dîlên rayedarên xwe yên êrîşkar in." Helwesta mirovên çekdar ku bi taybetî navê Komandar Şamîl Basayev derket pêş, bû sedem ku gelê rûs guh bide daxwazên wan. Çalakdarekî mafê mirovan ê rûs der heqê Basayev de wiha digot: "Basayev baş dinasim, ew nikare mirovan bikuje."

Li gorî çavdêran Çeçenistan ji dema Yekîtiya Sovyetê ve wekî navenda mafya yê tê zanîn. Ji ber vê yekê Yeltsin di civîna çapemeniyê de li hemberî pirsekê hêrs dibû û Çeçenistan wekî "Warê serhildêran, navenda terorîzma dinyayê, bertîlxwarinê, karên xurifî û mafyayê" bi nav dikir. Lê tê zanîn ku karên kirêt li seranserên komarên Yekîtiya Sovyetê yên berê tên kirin. Gelê çeçen jî ji van mirovan dikişîne, kes nabêje şerê çeçenan bi destê mafyayê tê meşandin.

Piştî lihevkirinê çekdarên çeçen tevî 150 dîlên ku bi dilê xwe tevî çekdaran çûn, gihîştin welatê xwe û hemû dîl hatin berdan. Niha hê jî agirbesta ku hatibû îlankirin û lihevrûniştinên ji bo çareseriyê berdewam in. Lê îcar parlementoya rûs dixwaze ku hikûmet ji ber vê têkçûnê îstifa bike û pirsa pêewlenebûnê tê rojeva parlementoyê. Li hemberî vê yekê Yeltsin parlementeran bi belavkirina parlementoyê û daxuyandina hilbijartina neasayî tehdît dike. Yeltsinê ku ji aliyê pir kesan ve wekî "serxweşek" î tê binavkiri,n dibe ku tehdîda xwe neyine cih, wê çaxê bêkêmanî îstifakirina çend wezîran, bi taybetî wezîrê karê berevaniyê û wezîrê karê navxweyî tê rojevê.

Piştî serkeftina şervanan gel jî dest bi meş û xwepêşdanan kir. Jin tevî pankartên ku li ser, "Yeltsin em naxwazin bimirin" hatiye nivîsandin, hildikişin ser tankên rûsan. Li aliyê din jina Fîzîkzanê rûs Andrei Saxarov, Elena Saxarov di 18'ê pûşperê de dest bi kampanyayekê kir. Di vê kampanyayê de tê xwestin ku bêyî merc û şert, şer rawest e û ji bo hemû şervanên çeçen efû bê îlankirin. Lê di eynî rojê de polîsên rûs çeçenên li Moskovê bi îdiaya ajantiyê girtin binçav, dîsa generalê rûs Anatoly Kulikov ji bo dewamkirina agirbestê radestkirina Basayev xwest. Her çiqas heyetê çeçen bi gotinê pejirandibe jî, kes baweriya xwe bi vê yekê nayine. Ji ber ku niha Basayev wekî qehremanekî tê dîtin. Ew gotinên Komandarên Çeçen Aslan Masxadov vê rastiyê nîşan didin: "Hemû mirov û rêberên çeçenan amade ne ku bimirin ji bo ku mûyek ji porê Basayev neweşe."

Raporên rêxistinên mafê mirovan nîşan didin ku Rûsyayê hemû qanûnên şer ên navneteweyî binpê kirine û şerekî kirêt dimeşîne. Serokê Komîsyona Mafên Mirovên a Parlementoya Rûsyayê Sergei Kovalev dide zanîn ku heta niha, di şer de nêzî 25 hezar sivîl hatine kuştin. Ji wan 3700 kes zarokên di bin 15 salî re, 4650 jin û 13.350 mêrên ku di ser 50 salî re ne. Tê gotin ku piştî şer 4 hezar kes koçber bûne. Rêxistina navneteweyî Human Right Watch (Çavdêriya Mafên Mirovan), dide zanîn ku balefirên Rûsyayê bêcudayî sivîlan bombebaran dikin.

Derdorên siyasî didin zanîn ku ev livbazî bûye sedema bilindbûna daxwaza aştiyê, di nava gelê rûs û çeçen de. Lê kes nizane ka wê Yeltsin heta ku derê guh bide vê daxwazê.

SAMÎ BERBANG

KURTEDÎROKA ÇEÇENÎSTANÊ

Dîroka çeçenan wekî dîroka liberxwedan û serhildanên li dijî dagirkeriya rûsan tê binavkirin. Dîroka vî gelî heta 3 hezar salî, berî zayîna Îsa (B.Z) diçe. Di sedsala 17'an de gelê çeçen bi piranî dibe misilman, lê hinek ji wan dibin fileyên ortodoks. Gelê çeçen, tevî gelên din ên Kafkasyayê di sala 1774'an de li hemberî rûsan dest bi şer dikin. Bi peymana Gulistanê di sala 1883'yan de warê çeçenan jî dikeve bin destê Rûsyayê. Tevî gelên li herêmê, di sala 1884'an de ew ber bi êrdima osmaniyan ve tên ajotin. Di adara 1920'an de ev der dikeve bin desthilatiya Yekîtiya Sovyetê, piştî du salan gelê çeçen xweserî bi dest xist. Di 23'yê 1936'an de Komara Xweser a Înguş û Çeçenan a li ser Yekitiya Sovyetê, hate îlankirin. Di 1944'an de ji aliyê rêveberiya Stalîn ve gelê Çeçenistanê bi îdiaya ku ew alîkariya naziyan dikin, ber bi Kazakîstanê ve hatin koçberkirin. Heta sala 1957'an wan nikaribû bizîvirin welatê xwe. Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê di sala 1992'yan di bin serokatiya Dudayev de çeçenan serxwebûna xwe daxuyandin. Di berfanbara 1994'an de bi êrîşa leşkerên rûs a ser Çeçenistanê, şerê çeçenan û Rûsyayê dest pê kir. Li Çeçenistanê ji sedî 60 çeçen–Înguş (2 milyon), ji sedî 35 rûs û ji sedî 5 jî gelên din dijîn. Aboriya vî welatî bi piranî li ser neftê ye.

Cerda çeçenan li civîna 7 dewlemendan, Yeltsîn xistê nava tengasiyê.



Çekdarên çeçen piştî guhftûgoyên dirêj daxwazên xwe dan qebûlkirin.

FAL

BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Hinek kes ji bo ku kîsê we vala bikin, ji we re hevaltiyê dikin. Pêşiyên me gotine: "Bi dev dixwe, bi rû fedî dike." Bes ew kesên ku li derdora we diçin û tên qet fedî jî nakin. Divê hûn wan kesan û hevalên jidil ji hev derînin.

GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Hûn ji guherînê ditirsin, li gorî felsefeya we; "Diya tirsonekan nagirî." Lê bêyî guherînê di civakê de bipêşketin çênabe. Heyberê ku xwe neperisîne, dixurife û tu tişt nikare wî/ê ji hilweşînê xelas bike.

CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Rast e hûn ji nivîsandinê gelek hez dikin û ew kar ji we tê. Lê wekî dibêjin: "Gihayê hewşê tal e." Hûn jî tu car nivîsên xwe naecibînin. Nivîsên ku kesên din li ser dîn dibin, qet li xweşiya we naçin. Hûn bi vî awayî nikarin bibin torevan.

KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Dinya ne roj û danek e, divê mirov bi tevdîr be. Bes diltenikiya we hin caran dike ku hûn vê qeyîdeyê ji bîr bikin. Bi taybetî van rojan divê hûn bêpere nemînin, li pêşiya we riya nexweşxaneyê dixuye.

ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Dema xelk hinekî pesna we dide, hûn xwe winda dikin. Êdî çavên we tiştekî nabînin. Bav û kalên me gotine: "Çêkiro bixwe kiro, xerakiro bixwe kiro." Lewre divê hûn xwe zêde bernedin, da ku hûn nekevin rewşên xerab.

SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Hûn pêşî mirovan bi rexneyên hûrbîn dîn û har dikin, lê dema bar dikeve ser milê we, hûn ji alîkariyê jî narevin. Ew tişt dilê hevalên we xweş dike, lê hin kes rewşa we dişibînin gotina,"Berf diçe, erd dimîne." Lewma ew guh nadin rexneyên we.

MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Di jiyana we de hevkêşeyek nîn e. Lewma hûn hin caran dibin nêçîr, hin caran jî nêçîrvan. Bi rastî jî hin caran divê mirov xwe ji we biparêze. Hevaltiya bi we re heta derekê xweş e. Ev dişibe gotina "Kêfa bûkê, heta sûkê."

DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Gotina, "Gelo ezo, bi destmala gul gevezo" rewşa we diyar dike. Dema hûn timtêlên xwe diguherînin, hûn jî êdî xwe nas nakin. Her çiqas piraniya hevalên we bi vê guherînê bixapin jî, hinek bi riya ku we deşîfre bikin hesiyane.

KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Hin caran hûn bi tevgerînên xwe, gotina: "Benîştê xwe, çûye bi netika xwe ve daniye" tînin bîra mirov. Pêşî hûn dilê mirovan dihêlin, piştre hûn poşman dibin. Dema ev tişt dikevin ser hev, êdî mirov ji niyeta we dikevin gumanê.

KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Hûn ji kêmasiyên xelkê îstifade dikin û wan ji xwe re dikin pir, ji bo ku xwe bigihînin mebesta xwe. Hin caran ji we tê ku hûn "Bi gur re bixwin, bi xwedî re şînê bikin." Hê ku tu kes bi vê tewra we nehesiyane, dev jê berdin.

DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Bi we jî xuya ye ku hewce bi guherîneke berfireh û rihvedayî heye. Lê hûn hêvî dikin ku "Av riya xwe bibîne." Heke hûn guh nedin hevalên xwe û dev ji vê stratejiya xwe ya çewt bernedin, wê bêhn bikeve avê.

MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)

Hûn hin caran li hemberî heqaretan jî qet xwe tevnadin. Rast e dilê fireh zû pîr nabe, lê gelo dilfirehiyê jî jê re sînorek nîn e? Heta kengê hûnê li hemberî zilma neyaran bêdeng bimînin. Jiyana wisa heta hetayê beçi jê tê?

Gurê simbêl sor

Yekî Stilîlî hebû, zehf jar û feqîr bû. Ji bizinekê pê ve tiştekî wî tunebû. Bizin bi roj xezala serê çiyan û êvarê delala malê, sebr û hedana maliyan bû. Kêfa kulfet pir pê re dihat. Ango yek ji kulfetê malê bû. Bi roj, bizin di nav keriyê gund de dişandin çêriyê. Yê Stilîlî jî (malxo) her êvar, mîna kesê xwedî terş bi kêf û evîn diçû pêşiya gund, pêşberî pez, qaşo ew jî xwedî terş û talan bû.

Rojekê gurek dikeve nav kêrî, bizina wî ji nav pêz digire, dibe û dikuje. Wê rojê, êvarê mîna her dem diçe pêşiya gund, li pêşberî terşê ku hêdî hêdî dihate nav gund, disekine. Tûtindanka xwe ji bêrîka xwe derdixe, çixarekê dipêçe, pêdixe û her çavê wî li keriyê pez e ku ji çolê, ji çêriyê dihat. Lê haya wî ji bayê felekê tunebû, bi çixare û maldariya xwe daketibû. Çaxa bizinên çalak li pêş û serê kerî ketin nava gund, çavê xwe li nav kerî, li bizina xwe gerand, lê bizina xwe nedît. Li çar aliyê kerî geriya, lê bizin nedixuya.

Radibe ji şivan dipirse, dibêje: "Kuro kanî bizina min?" Şivan wisa bi xof dibêje: "Bizina te gur xwar, cendekê wê yê bermayî jî li filan derê ye." Mîna ku tu şivekê li pozê wî bidî. Gelekî li ber xwe ket, lê bi rastî zehf li ber bizina xwe ket. Ji aliyê jiyana aborî ve kete bêhêviyeke kûr û tarî. Çixareya xwe avêt, pêlê kir, pelçiqand. Herdu destê xwe bi jor ve hilda û got: "Xweda, Xwedayo! Ma ji nav wî terşê bêser û bêbinî (bêdawî) ji bilî bizina min, sebra ber dilê min û yê kulfetê min, te tu sewalê din nedît ku di devê şêrgelê xwe; gurê hov û har xînî?" Carinan jî ji ser hişê xwe diçû, diket guman û ramanan, keserek berdida û dibû niçe niça wî, cendekê bizinê û gurê dev û pozê wî tev de xwîn dihate ber çavê wî. Bi kurtasî kul û kedera bizinê ji dilê wî dernediket. Her kêlî di bîra wî de bû. Ma wê çawa ji bîra wî derketa. Êvarê wê kulfet bi çi şa bûbûbaya. Ya jiyana aborî? Ji wê jî bêhêvî mabû.

Rojiya remezanê, roja yekemîn, demjimêr (saet) li dehê rojê, li mala xwe çixarekê dipêçe, pêdixe, dixe devê xwe û berê xwe dide Derxanê (cihê civîna gundiyan), dixan bi ser serê wî diket. Çend mirov pê ve rabûn "Lo, lo, lo, lo ji xwedayê xwe bitirse, ew çi çixare ye di devê te de? Malxerab, îro rojiya remezanê ye." Jixwe mêrik tu bersiva wan jî neda. Du sê hilmên din jî li çixareya xwe da. Paşê melayê gund (Mele Şêxmûs) got:

– Kuro, ma tu ne bi rojî yî?

– Na, ez ne bi rojî me.

– Ji bo çi te rojî negirtî ye?

Dîsa cendekê bizinê û gurê dev bixwîn tê ber çavê wî dibêje:

– Ê min, ez jê re rojiyê nagirim, bila simbêl sorê wî jê re rojiyê bigire.

Î. OMERÎ

Helawa bêpere

Zilamek di nava bajêr de, di dikana xwe de helawê difroşe. Milet jî ji bo ku helawê bikire, pêl hevdu dike. Bektaşî jî di nav milet re pereyên xwe dirêjî dikandar dike û helawa xwe digire, dixe nav nanê xwe û dixwe. Wexta ku bektaşî dike ji nav milet derkeve, here. Dikandar dîsa pereyan ji bektaşî dixwaze. Hingî milet pir e qey dikandar xwe şaş kiriye. Bektaşî vedigere ji dirandar re dibêje: "Min pereyên xwe dan lawo, tu fedî nakî, lê dixe, diçe.

Zilamekî ixtiyar jî lê dinêre ku dikandar xwe şaş dike. Kalo jî rebeno hêlekê birçiye, helêkê jî pereyên wî tunene. Dikandar jî helaw da wî yê ixtiyar û kalo helawa xwe girt, pere neda û çû. Dikandar ji kalo re got: "Kalo, kalo te pereyên helawê nedan." Kalo lê vegeriya got: "Min da lawo, tu fedî nakî." Li wira kalo û dirandar kire xire cir. Zilamê wê derê ji dikandar re gotin: "Tu fedî nakî, kalo çawa pere nedaye, dev ji berde, eyb e.

Dikandar ji fediya milet, dev ji kalo ber dide û kalo jî diçe. Kalo helawa xwe têr xwar û ji xwe re wiha got. "Yarebî tu îşê xwe zanî, ji wir bigire bide vira, ji wir bigire bide wira. Yarebî ji bêrîka ehmeqan, min îro jî zikê xwe têr kir."

ZINAR ALMAZ
ELMANYA

Zarokên 3 salî û îngilizî

Rojekê Selîmoyê dîn ji Misircê radibe diçe Îngilistanê. Roj û meh derbas dibin, Selîmo vedigere malê. Kesên ku bihîstine Selîmo hatiye, weyliwîn ku wî bibînin û behsa xeribiyê jê hîn bibin.

– Selîm lawo de ka bibêje li Îngilistanê çi hebû, çi tunebû?

Selîmo bersiva wan dide:

– Ez xulam qet nepirsin, wellah û billeh û telleh û bi her sê telaqê bêfitû, mirovên îngiliz ewçend biaqil bûn ku zarokên wan ên 3 salî jî bi îngilizî mijûl dibûn.

Bi bavê Hasan Ocak Baba Ocak re sohbetek

'Serê gelê kurd û tirk sax be'

Muxabîrê me Salih Kevirbirî, bi Baba Ocak, bavê Hasan Ocakê ku hatibû revandin û di 27'ê adarê de jî meytê wî hatibû dîtin re hevpeyvînek çêkir. Em wê hevpeyvînê diweşînin.

Hûn (malbata Ocak) bi eslê xwe ji ku derê ne?

– Em bi eslê xwe ji devera Dêrsimê, ji gundê Çalikê ne. Malbata me, di sala 1970'an de koçî Elezîzê bû, di sala 1987'an de jî em hatin Stenbola xopan.

Em dixwazin Hesen bi nêrînên we bidin nas kirin.

– Hesen mirovekî demokrat û şoreşger bû. Ji derdora xwe hez dikir, bi rastî ew jî zehf dihat hezkirin. Herdem di çalakiyên pêşverû de dihate dîtin. Nedixwest ku tadeyê li ser çivîkekê jî bike. Hesen mekteba (dibistan) bilind a mamostiyê li Sêrtê qedand, li gundekî Sêrtê jî dest bi mamostetiyê kir. Lê ji bo ku rojekê mamosteyekî şimaqekê li xwendevanekî dide, Hesen vê yekê qebûl nake û dev ji mamostetiyê berdide. Di vê mînakê de jî hûn dilovaniya Hesen dibînin.

Beriya ku Hesen were revandin li ser malbata we û li ser Hesen tu êrîş û tade hebûn an na?

– Beriya ku Hesen were revandin bi 2–3 mehan, carekê hêzên dewletê bi ser mala me ve girtin. Li Hesen dipirsîn, ji me re digotin: "Bila bala we li ser kurê we be, nexwe ji were ne baş e. Hesen di salên 86–87'an de jî, 2–3 caran ketibû binçav. Carekê ji bo pirtûkekê çend rojan di bin çav de mabû. Beriya revandina Hesen bi 4 mehan (8.11.1994) dîsa polîsan avêtin ser mala me û lê pirsîn.

Piştî ku Hesen revandin û we çi kir?

–Wekî hûn jî dizanin, Hesen 21'ê adarê, roja Newrozê hate revandin. Tu der û dever neman ku me serî lê neda. Di 28'ê adarê de me li Komeleya Mafên Mirovan (İHD) şaxa Stenbolê dest bi greva birçîbûnê kir. 22'ê avrêlê (nîsan) jî me li rêxistina CHP'ê dest bi grevê kir. Ji Stenbolê em çûn Enqereyê. Li wir li navenda giştî ya İHD me dest bi grevê kir.



Muhaxabirê me Salihê Kevirbirî bi Baba Ocak re te dîtin.

Li Enqereyê ji bo hevdîtinan serokwezîr jî di nav de, me gelek serlêdan li wezîrên dewletê kirin. Lê kesî tu bersîv neda me. Tenê Cîgirê Serokê Parlementoya Tirk Kamer Genç bi me re rûnişt. Greva me ya birçîbûnê li CHP'ê 2'yê avrêlê dest pê kir, di 18'ê avrêlê de jî me qedand. Ji bo ku me tu bersiv negirt, di 19'ê avrêlê de me CHP dagir (îşgal) kir, di avahiyê de, me 11 personel jî rehîn girtibûn, lê me muameleyeke însanî bi wan kir. Dema ku vê îşgalê dom dikir, di 25'ê avrêlê (nisan) de cendekê (cenazeyê) Hesen bi rêberiya rayedarên emniyetê û dozgerên cumhuriyetê li "Goristana Bêkesan" tê binaxkirin (veşartin). Lê tu agahiya me ji vê bûyerê tune.

Di 15'ê gulanê de li morga adlî tipê me xwest ku em wêneyên cesedên ku ji 21'ê adarê heta 15'ê gulanê hatine binêrin. Me li raporan nêrî. Dema 27'ê adarê cesedê Hesen anîbûn morgê wêneyên ku kişandibûn me di dosyayê de dîtin, cihê cesed tesbît kir. Piştî gelek asteng û tadeyiyên dewletê, me gora Hesen vekir, malbata me ew teşhîs kir.

Wekî hûn dizanin îro dewlet, berê xwe daye gelê kurd. Li aliyê din jî li bajarên Tirkiyeyê mirov di nava rojê de, têne revandin. Hûn van bûyerên dijmirovî çawa dinirxînin.

– Îro dewlet ne li Kurdistanê, ne jî li Tirkiyeyê kesên demokrat, şoreşger û welatparêz dixwaze. Li dîjî wan fen û fotan dike. Ma qey mirov bi kuştina yeko yeko tu car xelas dibin? Na!.. Dewlet ji bo ku bitirsîne, biperçiqîne; tehdît dike, nebe dikuje. Heta vê gavê bi vî awayî bi dehhezaran kes winda bûne û hatine kuştin. Hesen jî yek ji wan bû, lê belê Hesenek here wê bi hezaran Hesen derkevin. Min cesedê Hesenê xwe dît, lê ez nemirim û bimînim ezê qatîlên wî jî bibînim. An jî ezê xwe li ber avahiya genelkurmayê bişewitînim. Bila serê şoreşger û welatparêzan û bila serê gelê kurd û gelê tirk sax be.

Qetilkirina Hesen li ser malbata we û li derdora we bi çi awayî tesîr kir?

– Malbata me bêhtir hişyar bû, xezeba me li dijî dewletê zêde bû. Îro em bextewar in, serê me bilind, eniya me jî vekirî ye. Li derdora me jî gelek tesîrên baş çêdibin. Dema ez derdikevim derve, herkes ber bi min tê û kefxweşiyê didin min. Cînar û kesên nenas, ji deverên dûr tên û piştgiriyê didine me. Dewlet bi hêzên xwe bû yek û Hesen qetil kir, lê em û hevalên hêja û dostên rojên reş bûn yek û bi mirîtî be jî, me Hesen dît. Dewlet têk çû, em bi ser ketin.

Birayê Hesen yê mezin Huseyin digot ku "Baweriya Hesen bi dozekê hebû, emê jî di riya vê dozê de bimeşin." Hûn der heqê vê ramanê de çi difikirin?

– Belê Hesen dildarê doza xwe bû. Îro ji bo doz û riya wî, piştî vî emrê xwe yê 65 salî ezê li Tirkiyeyê tev bigerim. Doh li Stenbolê, îro em li Edeneyê ne, sibe Mêrsîn, Hatay, Îzmîr. Di dawiyê de jî emê herin Kurdistanê; Diyarbekir, Dêrsim, Elezîz û hwd.

Piştî van bûyeran hûn bêdengiya gelan çawa dibînin?

– Ji bo ku gel li dîjî van cinayetan bêdeng nemîne, me li meydanan wiha digot: "Bêdeng nemîne, tu bêdeng bimînî wê dor were ser te jî" gel bi piranî jî gelê tirk li mafên xwe bigeriya, li metropolan ev cinayet û înfazên bêdarizandin çênedibûn. Ji ber vê yekê em dibêjin, "Îro çi bê serê min, ji bîr neke wê sibê were serê te jî."

HEVPEYVÎN: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Yên berî me çi, çawa dinivîsandin

Ji dîroka rojnamegeriya kurdî

Nivîsek ji hejmara 15. a Kovara Ronahî Mêjû: 1943, meha pûşperê

AMEDIYÊ Û SÛLAV

Layê jorî yê Iraqê, gelek çiya û çelixtêt bilind hene. Li mabeyna van çiyan û çelixtan çiyayek heye, dibêjinê Metîna an Bişêş.

Ev Bişêşe gelek yê bilind e. Paşê hêdî hêdî nizim dibît û digehît geliyekî şox û can, dibêjin–ê geliyê Mizûrka.

Piştî hingê ev Bişêşe pehnati û dirêjahiya xo diraçînit heta digehîte girekî gelek bilind. Li serê wî girî bajarê Amêdiyê dikevîte xar. Li dora wî bajarî şuhreke mezin heye. Ev şuhre li berê hatiye çêkirin. Çu rê naçin–ê li bijli du dergehên asinî. Ji êki re dibêjin–ê Dergehê Zêbarê. Ev şuhre gelek ya bilind e. Hindek rexêt wê bi 30 heta 40 bejina ya bilind e.

Heta niho di nav çîrokan û metelokan de dibêjin: Amêdiyê hatiye danan li berî Mihemed pêxemberî bi sed salan.

Geliyê mizûrka geliyekî can û sax û şepal e. Li binê wî geliyê rengîn aveke boş û cemidî û zelal derdikevit; herwekî befrê ya tazî ye û wek şîrî ya spî ye. Dibêjin–ê (ser û kanî). Paşê ew dê bête belav kirin li ser rez û baxan.

Paşî hingê ev av dê kom bibîte ve û dê çît ser rûyê erdî; bi dengekî bilind û şîrîn, bi çûneke çelek û delal, li mabeyna wan beran, bi dilekî xoş û çûneke can, herwekî bûkeke li şeva xenayê.

Paşê ev av li mabeyna giyayê kesk û darêt xemilî dê gehîte kevirekî zor bilind dibêjin–ê Sûlav.

Bilindahiya wî kevirî nêzîkî sed bejinan bilind e. Wextê av li serê vî firokeyî dê bête xar, bi dengekî bilind û dijwar, wekî dengê evrêt Nîsanê li wextê Paîzê.

Ewî wextî zozanî têne Sûlavê û berê xwe didine vî rengê entîke ko Xudê pêşkêşî xelkê vî bajarî kirî.

Zozaniyên me vî demî req û hişk dibin, nizanin berê xo bidene: Vê dîtina beheştin an hêlînêt teyra, an dengê bilbila, an xişexişa belkêt dara yên ko hewayê nazik didet. An ava tazî û sipî û zelal, an wan şkêftêt ko Xudê bi himeta xo diris kirîn. An tîroşkêt rojê wextê beyana spêdê tê de derê serê çiyan û çelixtan. An dîtina keskesorî wextê roj li Sûlava rengîn didet.

Wê gavê ewî hiş ji xo namînît û her rehek li leşê wî xo dihelavêt li ber vê kêfê.

Ewî wextî ageh li xo namînît; herwekî ew li nav beheştê ye.

Eve ye Sûlava rengîn, eve ye beheşta ser dinyayê.

Imêda min ya bi Xudê xoş e, bi wextekî kêm digehîte mirad û meqûsda xo, dê gehîte xoşî û lezetêt xo.

Êdî bijît Sûlav û Amêdiyê bo xoşiya Kurdistanê

SALIH REŞÎD AMEDÎ

Bi Serokê HADEP'a Stenbolê Kemal Parlak re sohbeteke rengareng

'Divê tevgerên aştîxwaz berfireh bibin'



Dr. Kemal Parlak hem siyasetê hem jî doktoriyê bi hev re dimeşîne

KETINA MIN A NAV SIYASETÊ

Di sala 1963'an de bi zanayî min dest bi sayasetê kir. Ango bi TİP'ê (Partiya Karkerên Tirkiyeyê) di gorepona (arena) siyasî de min cih girt. Digel tevgerên xwendevanan di sala 1968'an de, bi zanayî ez xebitîm. Di sala 1969'an de di xebata FKF û DDKO de cih bi cih min pişikdarî kir, digel wergirtina erkê sekreteriya giştî ya Komeleya Tabîbên (Nûjdarên) Stenbolê (İTO), bêrawestan ez xebitîm.

Piştî 12'ê îlona 1980 û 1985'an di navbera salên 1985–1991'an de, di nav rêzên SHP'ê de, wekî gelek rewşenbîran min jî kar kir. Piştî bombebarankirina Şirnexê ji SHP'ê cuda bûm û di sala 1991'an de ez tevlî HEP'ê bûm. Di vê dema ku nêzîkî 30 salan e, li pêş ronahiya bîr û baweriyên sosyalîzmê di warê siyasî de ez xebitîm.

Cudahiya xweşî û nexweşiya xebata siyasî di nav rêzên SHP'ê û HADEP'ê de çi ye?

– Helbet, xweşiya xebata siyasî di nav SHP'ê de tê texmînkirin, mirov bi dudilî ye. Sergeha partiyê, wekî rêveberiya dewletê xwe dibînin û bi vî çavî li bingeha xwe dinêrin. Mirov xwe li vê derê piştrast dibîne. Mayina li nav vê partiyê (SHP) digel xwe du tiştan pêk tîne. Kesê rewşenbîr, li dûv dilê xwe nikare kesayetiya xwe diyar bike. Nemaze, siyaseta rojane, têkiliyên hevnasînê bi pêş dixe. Ev tengasiya SHP'ê ye Hûn wezîran (şalyaran) dibînin, ew ne rûdana kursîkan e. Ji ber ku berî bibe wezîr, wî ji me re tiştin gotine, lê piştî ku dibe wezîr vêca ew tiştekî dîtir dike. Ev jî bi tevayî encama siyaseta giştî ya partiyê ye. Ji ber nebûna pirs û bersivê bi rengekî berbiçav wekî kes, mirov nikare guherîneke tevayî pêk bîne. Li ser HADEP'ê jî zordariya dewletê heye, lê di xebata demokratîk de jî mirov metirsiyê raserî çavên xwe neke, tiştek bi cih nayê. Ev in tengavî û asteng. Tiştên herî girîng parastina kesayetiyê ye.

Ji bilî zordariyên dewletê, di HADEP'ê de, astengiyên ji bo pêkanîna siyasetê çi ne?

– Pêkanîna xebata siyasî ya di nav rêzên HADEP'ê de, ji ber ku li hemberî hemû rengên zordariyê ne, hinekî zor e. Hûn jî dizanin ku cemawerê (kitle) me ji deverên çolteran (kırsal) tên. Mirovên çolteran, li dûv çand û rewşenbîriya devera xwe karê siyasî dike. Lê ev mirovana, ji dil dixebitin. Heger bi rengekî din em bibêjin, bêyî berçavkirina berjewendiya xwe ya taybet, li ser bingeheke baweriyê têkoşîna xwe dide.

Rewşa HADEP'ê ya dawî li Stenbolê çi ye?

– Divêt ji du aliyan ve em li bûyerê binêrin, yek; ewên ku ji derveyî me HADEP'van in ku bi kiryarên xwe piştevaniya me dikin, hene. Yên duwemîn jî, endamên me ne. Ewên ku ji aliyê me ve hatine rêxistin, beşekî herî biçûk e ji cemawerekî berfireh. Li vê dûmahîkê hindek geşbûnên nû jî hene, ew jî nêzîkbûna rewşenbîrên me ne yên ku nêzîkahiyê li me dikin.

Ewên ku ji partiyên din têne cem we, nexweşî û fêrbûnên xwe yên kevin bi xwe re tînin?

– Naxêr. Helbet, nekû aloziyên biçûk rû nadin lê ziyanê digihîne wî bi xwe û ji bo pêşketina wî di nav rêzên partiyê de dibe asteng.

Li vê dûmahîkê, gelek kesan ji Kurdistanê ber bi rojava bar kir. Wekî ji aliyê we (HADEP) ve jî hate gotin ku piraniya evên nûhatî ne neqeydkirî ne (tomarkirî ne). Wekî din jî, li gorî zanîna we, hejmara kurdan li Stenbolê çend e?..

– Em, partiyeke tevayî ya Tirkiyeyê ne, lê cemawerê (kîtle) me yê herî mezin, ji kurdan pêk hatiye. Yanî hatina beşekî mezin ji yên nûhatî, tirsa wan ji zordariya dewletê, tiştekî asayî ye. Li vir, ez rexne li kadroyên rêveberiya partiyê digirim. Ew li şerê ku li rojhilat diqewime dinêrin û îtibarê bi girîngiya xebata legal nakin. Ji bo nehêlana vê nêrînê, hêj me nû dest bi kar kiriye. Girîngiya mirovên ku hatine hilbijartin, divêt ji kurdan re bê gotin. Ji ber ku konjanktora cîhanê vê yekê rewa dibîne. Ji ber vê yekê rola mebûsekî yan jî, rola serokekî bajarvaniyê, têkoşîna girseyî (kitlesel) û reaksiyona wan dide xuyakirin. Lewra, îtîbar bi xebata demoratîk a legal nehate kirin û ji bo tomarkirina (qeydkirina) endaman, xebat nehate kirin.

Dema DEP'ê, tomarkirina endamên derdorê, gihîşt 10 hezarî. Yê ku ji deverên çolterê (kırsal) hatiye, zû bi zû nabe endam. Ev kesê ku bi salan e ji bo yekî din dibeze, di 3 salan de tu nikarî bikî ku ew ji bo xwe bixebite. Ez dibêjim, ji sêyeka (ji sisiya yek) Stenbolê kurd e. Helbet, eger û sedemên vê çendê hene. Gelekan ji van, êdî nasnameya xwe ji bîr kirine.

Her wekî tê zanîn ku tu doktor î jî, gava ku Kemal Parlak tê gotin, pêşî doktor an jî konevan tê nasîn. Gelo kîjan berî kîjanî ye?

– Ez hemû deman, ji bo ku doktorekî baş bim, xebitî me. Heta bi sala 1983'an di vî karê xwe de min gelekî li ber xwe da. Ji ber vê yekê her du, têkilî hev bûne. Lê doktoriya min jî hemû deman karê min a serekî bûye. Ji ber vê yekê ez nikarim tiştekî bibêjim.

Dema DEP'ê, qeydkirina endamên derdorê, gihîşt 10 hezarî. Yên ku ji deverên çolterê (kırsal) hatiye, zû bi zû nabe endam. Ev kesê ku bi salan e ji bo wekî din dibeze, di 3 salan de tu nikarî bikî ku ew ji bo xwe bixebite. Li vî bajarê (Stenbol) ku ji sisiya yek kurd e, potansiyeleke mezin heye.

Bernameya te ya heftiyekê çawa derbas dibe? Yanî, hem li nexweşxanê û li buroya karê xwe û hem jî xebata te ya konevanî?

– Ez bibêjim. Di heftiyê de 8 saetan li nexweşxaneyeke taybet dixebitim. 12 saetan jî li nivîngeha xwe ya taybet derbas dikim. Ji bo jiyana xwe ya aborî jî çend saetan ji bo xwendina pirtûk û kovarên ku bi karê min ve girêdayî ne, ez cuda dikim. Ev jî, ji ber du egeran e: 1. Ji bo berdewamkirina jiyana xwe divêt min agah ji her tiştî hebe. 2. Wekî hûn jî dizanin ku zanistî roj bi rojê geş dibe û bi pêş dikeve, ango, pêdivî ye ez li dûv herim.

Hûn dizanin, kesên kurd ji sazûmanên sivik (wekî çûna cem parêzeran, doktoran û saziyên fermoyî) xwe vedikişînin...

– Belê, xwe vedikişînin. Ev axaftin jî, bi taybetî jî jinan digire û her wisa di kar û barê psikyatrî de li ser mêrê xwe bi yekcarî napeyivin. Ji ber egerên sinc (exlaqî) û edetî, li ser kiryarên narewa (wekî lêxistin û hwd.) yên mêrên xwe napeyivin.

Hûn, mîna mirovekî xudan mizac û rewişteke nerm xwe didin xuyakirin. Her wisa di nav kurdan de yên xudan mîzaceke herî hişk zaza ne û hûn jî zazan e. Hûnê çawa vê yekê ji me re şîrove bikin gelo?

– Bi rastî jî zaza hişk in. Gava ku hûn li bizavên kurdan yên herî mezin dinêrin (Şêx Seîd, Seyid Riza) her zaza têne dîtin. Bi gelemperî ez ji zarokaniya xwe de aheng û yeksaneya di navbera tiştan de berçav dikim. Bavê min û bapîrê min şerê hev dikirin. Bo nimûne birayê min alî bapîrê min dikir. Min jî ji bapîrê xwe re digot: "Kalo, ma ne ew kurê te ye. Tu çima ewqas meselê mezin dikî" yan jî min ji bavê xwe re digot: "Ew bavê te ye, şer û gengeşe digel nayê kirin." Di sala 1963'an de, dema ku min li Amedê amadeyî (lise) dixwend, ewê hingê li navbera Sêwrekiya û Qoseriyan (Kızıltepe) de şer derdiket. Berî peydabûna hestê neteweyî, deverperestî hebû, min ji wan re digot ku min navêt şerê kesekî bikim. Ew birayên me ne. Ji ber vê çendê wê hingê (1963) (Xwedê jê razî be) Necmedîn Büyükkaya li ser vê axaftina min hêrs bûbû.

Ji ber berçavkirina berjewendiya giştî min wisa kar dikir. Ev, dibe ku ji şêweyê xudankirina min jî tê. Di vê yekê de rola doktoriyê û ezmoniya siyasî jî heye. Di ezmoniyên xwe de me dît ku peyvên pir tûj dibe ku mawey demekê akama xwe li ser cemawer bihêlin, lê ji bo demeke dirêj ji layê cemawer ve nayê herêkirin. Ew pêzanînên ku bi bêhnfirehî û di demeke dirêj de ji layê

cemawer ve hatin têgihiştin, ew hingê dibin hêz û di warê jiyanê de têne bi kar anîn.

Peyvên tûj dibe ku bêne gotin, lê têkoşîna mukum û bi bêhnfirehî ku ji layê cemawer ve hatiye têgihiştin, ji mirov re dibin alîkar û piştevan. Heger tê bîra we, heyamekê ji bo min digotin, "Doktorê ku ji SHP'ê hatiye, di 6 heyvan de bûye berpirsê DEP'ê yê parêzgehê (wilayet) û dihate zanîn ku ez mirovekî nerm û dilovan im, ji ber vê yekê ezê zû birevim. Yanî, mirov bêhnfireh û dilovan be, ev ne astengek e li pêşiya pêşkeftina kesan. Ev 3 sal in ku bi vî rengê xwe, ez di arenaya xebatê de cih digirim.

Ji bo daxuyakirina êş û azarên şerê li Rojhilat û ji bo pêş– lêgirtina siyaseta dewletê, afirandina platformeke demokratîk û berfireh pêdivî ye. Ev jî tenê bi şêweyekî çak, fireh û bi aramî pêk tê.

Di kongreya parêzgehê ya vê dawiyê de, tu yekane namzed bûyî. Yekane namzedî û bi ser de jî mirov bê hezkirin bêguman tiştekî baş e. Lê, tiştekî din jî bala mirovan dikişîne. Gelo, di nav rêzên partiyê de, kesên siyasî ne kêm in?

– Her wekî we jî da xuyakirin, xoşewistiya mirov ji layê cemawer ve, li xweşiya mirov diçe. Her wisa ev rewşa bi vî rengî ji min re cihê rûmetdarî û bexteweriyê ye. Belê her wisa cihê daxê ye jî. Kêmasiya berhevbûnên siyasî, dûrketina rewşenbîran ji rêzên partiyê, ev hemû, ji bo pirbûna namzetan asteng in. Tengaviya me di vir de heye. Ji bo derketina namzetekî din em pir xebitîn. Lê mixabin ku me nekarî em peyda bikin. Ev rewşa han, ji bo hemû parêzgehan wisa ye. Vêca ji bo Stenbolê, hindek taybetmendiyên wê hene.

Berî her tiştî namzetên ku xudan cihekî pîşeyî ne, yan jî xudanê bernameyeke partayetî ne, diviya hebûna. Lê mixabin ku me nekarî em vê qonaxê derbas bikin.

Her wekî hûn jî dizanin ku gelek kes ji cihekî derbasî bizava kurdî dibin, mawey demekê dimînin û paşê di cihekî din re derdiçin. Carcaran tu ji xwe re nabêjî "Ev kurd nabin mirov, de ka ez jî li mala xwe rûnim." Ango tu caran tiştekî wisa te di bîra xwe de aniye?

– Naxêr. Kerba min ji mirovên bêguneh venabe. Lê, ji kesê rêveber kerba min vedibe. Gava ku erkên xwe bi cih nayênin ez gelekî zivêr (aciz) dibim. Her wisa hinek kes hene, li ser baweriyên xwe yên berê dimeşin. Divêt bête zanîn ku êdî, em ne di salên 1968–1975'an de ne. Mirovên salên 1995'an, ramana xwe guhartine, daxwazên wan cudan e. Lewra pêdivî ye yê kadro jî li dûv van daxwazan be. Heger, yeksaneyeke bi vî rengî neyê peydakirin ev kar bi rê ve naçe.

Pirsa we ya bicîhiştina partiyê me neaniye bîra xwe, lê heyamekê min xwest rêveberiya parêzgehê bihêlim. Carekê jî, li dema damezrandina DEP'ê di amadekirina lîsteya meclîsa partiyê de, bi palpiştiyeke biçûk ya hinekan, lîsteyek hate pêşkêşkirin. Wê hingê Xwedê jê xweş be Muhsîn Melîk hebû, min ji wan re got: "Heger hûn bi palpiştiyeke wisa vê lîsteyê bînin, ezê vî karî bihêlim. Bihêlin bila xebatgeriya partiyê berfireh û geş bibe.

Ji ber karê te, car caran têkiliyên te yên digel nexweşan û yên digel mirovan tevlî hev nabin ?

– Arama min ya di psikyatriyê de, di karê minî partiyê de alîkariyê bi min re dike. Gava ku hinek kes, di nav rêzên partiyê de bizavên nelirê dikin, ez di cih de li ser egerên rûdanên bi vî rengî radiwestim û dest bi ramana xwe dikim. Yanî, bi şêweyekî klasîkî tu dikarî bibêjî, "Rûne, li cihê ku tu lê rûniştiyî"

Baş e kîjan zortir e ?

– Helbet siyaset zortir e.

Nexweşên ku tên cem we, mirov dikare daxuyakirineke bi vî rengî bike, gelo kurd bêhtir in an tirk?

– Wekî doktorekî, li nik min di navbera mirovan de tu cudayî nîn e. Ji ber ku ez endamekî HADEP'ê me jî tu kes li dijî min ne rawestiya ye.

Bi gelemperî tê gotin ku bi mirovê kurd re kompleksa xwekêmdîtinê heye. Her wisa li welatekî mîna Tirkiyeyê, li cihên herî bilind yên siyastê kesên kurd têne dîtin. Tu dikarî ji me re vê yekê şirove bikî?

– Mirovê kurd, ji bo şikandina vê çembera dormandorî xwe (siyaseta ku serê 70 salan e tê bikaranîn) em dibînin ku bizavê dike, li ber xwe dide. Di piraniya tevgerên sosyalîst de kurd hene. Bi kurtayî çi bi aşkerayî, çi bi nehênî, mirovê kurd gelek karan dike. Heta niha ji xwe re çi kar nekirine, lê ji ber vê yekê îro daketine gorepana (arena) xebatê. Siyaseta taybet ya dewletê û kiryarên wê dirindane psîkoljiyeke bi vî rengî peyda kiriye. Berahîk (pêşî) li geşbûna kesayetiya mirovê kurd girtiye. Kesê ku rê li ber bê girtin jî, tê vederkirin (tecrîtkirin). Li cem me jî gotineke wisa heye: "Kurd nabin mirov." Sedem hemû ev in. Hindek ji kurdan ji bo ku li hemberî kirêtiyên bi vî rengî rû bi rû nemînin xwestin, wekî zordarê xwe bin. Ev dibêjin, "Madem ku ez wekî kurd, nagihîm çi deran, wê hingê mîna endamekî partiya Türkeş an jî di SHP'ê de mîna Hikmet Çetin, ezê karibim xwe bigihînim hindek cihan. Her wisa ramanên bi vî rengî bi kurdan re dest pê dike. Lê bi têkoşîna li van salên dawî û ji salên 1960'an pê ve encama xebata ku ji layê hindek kes û sazûmanan ve hate kirin, ev zincîr hatiye şikandin. Êdî mirovên kurd, wekî berê "Ez nikarim vî karî bikim" nabêjin. Ji bo nasname û geşkirina kesayetiya kurdan êdî hêzek heye.

Di rewşa îro de derxistina şerê di nav gelan de ji aliyê hinekan ve hinekî zor e... Provokasyonên bi vî rengî jî, tenê dewlet û hêzên pêve girêdayî dikarin bikin.

Berê radyo, televîzyon, pirtûk, kovar û yên mayî, bi zimanê kurdî tune bûn. Lê îro wan jî di jiyana kurdan de cihên xwe girtine.

Hûn dizanin, di 25'ê pûşperê de kampanya bi kurdî dest pê kir. Ji bilî vê jî zazakî li gorî zaravên dîtîrî kurdî li dûv daxwazê nayê bi kar anîn. Nêrîna we li ser vê çi ye?

– Ev kampanya gelekî girîng e. Ji ber ku zimanê zikmakî, navgîneke herî girîng e ji bo danasîna mirovan. Heger ji mirovekî, tu zimanê wî yê zikmakî bistînî, te ew kes kuşt. Ji ber vê çendê xebata lêxwedîderketina ziman, xebata lêxwedîderketina mirovan e.

Hem ji bo tirkî, hem ji bo cîhana me dewlemendiyek e. Di bûyera zazakî de ez dikarim wisa bibêjim. Divêt ev zarava jî bête parastin, lê, ji layê yekgirtina neteweyî ve divê zimanekî yekgirtî hebe. Ez dibêjim zaravê kurmancî di vî warî de xudanê arenayeke fireh e.

Nêzîkbûna rewşenbîrên kurdan ji bo zimanê kurdî tu çawa dibînî?

– Nebaş dibînim.

Di jiyana xwe ya rojane de, tu zimanê kurdî çiqasî bi kar tînî, yan jî yên rewşenbîr, çiqasî bi kurdî dipeyivin?

– Ez li nexweşxaneyê bi hinek nexweşan re bi kurdî (zazakî) dipeyivim. Wekî kes, ez dikarim vê yekê bibêjim ku di vî warî de sûcê me zêde ye û gunehê me pir e.

Gava ku em li rewşa Tirkiyeyê dinêrin, îhtimala derketina şerê navxweyî heye gelo? Hûn vê yekê çawa dibînin?

– Di rewşa îro de derxistina şerê di nav gelan de ji layê hinekan ve hinekî zor e... Provekasyonên bi vî rengî jî, tenê dewlet û hêzên pêve girêdayî dikarin bikin.

Zemînekî wisa heye gelo?

– Li deverên ku kurd û tirk pêkve dijîn, tiştekî wisa nîn e. Bo nimûne, li devera Karadenizê, gava ku termê leşkeran tên, nexweşî peyda dibin. Lê, li wê derê jî, kurd nîn in. Li devera Ege jî heta niha rewşeke bi vî rengî di nav gelan de peyda nebûye. Hindek komikên faşîst ên ku bi dewletê ve girêdayî ne, di vî warî de xebata wan heye. Heger cengeke wisa rû bide, ez dibêjim, ji layê hinekan ve wê bê destpêkirin. Niha rewşeke wisa nîn e.

Ji bo rêlibergirtina rûdaneke bi vî rengî, kar û xebatên HADEP'ê hene gelo?

– Dewlet, wekî partiya PKK'ê dixwazê me bide nîşandan. Lê heta ji me bê, em destûrê nadin vê niyaza dewletê. Di vî warî de erkên rewşenbîr û demokratan jî hene. Divêt tevgerên aştîxwazane bêne berfirehkirin. Her çendî kêm be jî, ev serê 6 heyvan e ku ez di vî warî de bi rewşenbîran re dixebitim. Di nêrîna min de, tevgerên bi vî rengî, tesîr li girseyê dikin.

Gelek hevalên min ên ji herêma behrareş ango karadenîzê telefonî min dikin û dibêjin, "Heger êrîşek bê ser te, li dijî van êrîşan em li cem te ne û em van êrîşan bêbersiv nahêlin."

HEVPEYVÎN: MAZHAR GÜNBAT

Di nav bi milyonan kurd li Stenbolê HADEP hewl dide ku hejmara endama zedêtir bike.

www.rcivan.org

Ji ber pêkûtiyên dewletê û cerdên gerîlayan cerdevanî her diçe ji hev dipelişe

Sîstema cerdevaniyê diheje

Şerê di navbera hêzên dewletê û gerîlayên ARGK'ê de, bi germbûna havînê her diçe dijwar dibe. Gerîlayan vê hefteyê êrîşên xwe yên li dijî cerdevanan gur kirin û li gelek deveran êrîşên xurt birin ser cerdevanan.

21.06.1995

Gerîlayên ARGK'ê, li Botan êrîşî du girên ku leşkeran tê de mewzî girtibûn, kirin. Di cerda gerîlayan de, 8 leşker û gerîlayek mirin, gerîlayek birîndar bû. Gerîlayan di encama cerdê de ev gir zeft kirin.

–Hêzên dewletê, li dora warê Katu Xalilanê (Çatak) dest bi operasyonê kirin. Li gorî agahiyan operasyon didome.

–Li Şemzînanê (Şemdinlî), li gundê Şişeyê, gerîlayan êrîş birin ser leşkeran. Di êrîşa gerîlayan de 3 leşker mirin, 2 leşker birîndar bûn.

–Li Gevera (Yüksekova) Culemêrgê, gerîlayan bi ser gundê cerdevanên Kaviya ve girtin, 7 cerdevan dîl girtin.

–Di navbera Sason û gundê Zingî de, gerîla û leşkeran li hev xist. Li gorî agahiyên ku gihîştin destê me, di bûyerê de 7 cerdevan mirin e.

–Gerîlayên ARGK'ê, bi ser navçeya Adaklı ku li ser Erzeromê ye ve girtin. Di cerdê de gerîlayan panzereke leşkerî rûxandin. 4 leşkerên di panzerê de mirin.

22.6 1995

Di 20'ê pûşperê de, gerîlayan êrîş birin ser qereqola Ertuşa ku li herêma Behdînan e. Di cerda gerîlayan de 24 leşker û 3 gerîla mirin, 2 gerîla birîndar bûn. Gerîlayan dest danîn ser malzemeyên cur bi cur.

–Gerîlayên ARGK'ê, li gundê Katisna ku li ser Şemzinanê ye, cerdevan xistin kemîna xwe. Di kemîna gerîlayan de 2 cerdevan mirin.

–Li Behdînan, li girekî nêzîkî gundê Sisê, gerîlayên ARGK'ê êrîşî mewziyên leşkeran kirin. Di êrîşa gerîlayan de, 9 leşker mirin.

–Li Oramarê, 25 cerdevanî dev ji cerdevaniyê berdan.

–Gerîlayan di 20'ê pûşperê de, êrîş birin ser gundê Kaşaxê ku li ser Motka ye. Di êrîşa gerîlayan de 5 tîmên taybet mirin, 5 jî birîndar bûn.

–Riya di navbera Sancak û Çewlikê (Bingöl) de, di 20'ê pûşperê de ji aliyê gerilayan ve hate birîn. Di kontrola rê de gerîlayan cerdevanek kuştin, 4 cerdevan jî dîl girtin.

23.6.1995

Gerîlayên ARGK'ê, riya Pilêmorî (Pülümür) û Erzinganê xistin kontrola xwe. Gerîlayan di kontrolê de, li nasnameyan nêrîn û propaganda kirin. Piştî kontrolê, di navbera gerîla û leşkeran de lihevxistinek qewimî. Di encama şer de 2 leşker birîndar bûn.

–Roja 21'ê pûşperê, gerîlayan êrîşî mewziyeke qereqola Ertuşê kirin. Gerîlayan ji du milan bi êrîşeke dijwar li mewziya leşkeran dan. Di cerda gerîlayan de 21 leşker mirin, der heqê birîndaran de agahî bi dest neketin.

–Operasyana hêzên dewletê, li Botan li warê Çiravê didome. Li gorî agahiyan heta niha tu şer di operaşyonê de neqewimine.

24.6.1995

Gerîlayan li çiyayê Cûdî êrîşî mewziyên leşkeran yên ku li girê Zerînkerê kirin. Di cerda gerîlayan de bi gulebaran û narîncoka (bonbê destan) 12 leşker û cerdevan mirin, 2 gerîla birîndar bûn.

Di 21'ê pûşperê de, li Çiyayê Gose, li nêzîki gundê Suniyê, di navbera leşker û gerîlayan de lihevxistineke dijwar qewimî. Der heqê zayîatên leşkeran de agahî bi dest neketin. Li gorî agahiyan di vî şerî de gerîlayek birîndar bûye.

–Hêzeke gerîlayên ARGK'ê bi ser navçeya Tatosa (Tekman) ku li ser Erzeromê ye ve girtin. Gerîlayan bi gule û narîncokan qereqola polîsan gulebaran kirin.

–Li Paloya (Palu) Mezrayê (Elaziğ) gerîlayan bi ser gundê cerdevanên Serê Çur ve girtin. Di êrîşa gerîlayan de 4 cerdevan mirin.

–Roja 22'ê pûşperê, li Motkayê, li Çiyayê Şêx Hebît, di operasyona hêzên dewletê de, gerîlayan êrîş birin ser tîmên taybet. Di êrîşa gerîlayan di 3 tîmên taybet mirin.

–Li Çewlikê, li gundê Kovancılar, endamekî ERNK'ê kete kemîna leşkeran. Di lihevxistinê de endamê eniyê mir.

–Gerîlayên ARGK'ê di navbera Gexî û Pilêmorî de, êrîşî leşkeran kirin. Di cerdê de 2 leşker mirin.

25.6.1995

Li Behdinan, di navbera gundên Zeydijnî û Gemenê de, du cerdevan bi mayînên gerîlayan mirin.

–Li Çelê (Çukurca), qereqola bi navê '49' ji ber cerd û êrîşên gerîlayan hate valakirin.

–Li gorî agahiyên ku ketin destê me, cerdevanên Gerdiyan naxwazin derkevin operasyonan û nexweşiyeke mezin di navbera wan û hêzên dewletê de heye.

–Roja 23'ê pûşperê, refek leşker di parastina riya Xabûrê de ketin kemîna gerîlayan. Di kemînê de, 7 leşker mirin, 3 leşker jî birîndar bûn.

–Gerîlayên ARGK'ê cerdî girê Tabûra Aşuyê kirin. Di êrîşa gerîlayan de 2 gerîla mirin, der barê mirî û birîndarên hêzên dewletê de agahî bi dest neketin.

–Şeva 23'ê pûşperê, gerîlayan bi êrîşeke dijwar çûn ser qereqola Çemê Pireyê ku li Botan e. Piştî êrîşê leşkeran qereqol valakirin.

–Cerdevanên herêma Behdînan ên gundê Beydûş, ketin xefika mayînan a gerîlayan. Der heqê mirî û birindarên cerdevanan de agahî bi dest neketin.

–Operasyona hêzên dewletê, li Motkaya ku li ser Bilîsê ye didome. Li gorî agahiyan firoke elebazarkî çiya bombebaran dikin.

–Hêzên dewletê, li Bilîsê, li çiyayê Şêx Hebît, li mayînên gerîlayan leqitîn. Di xefika mayinan de leşkerek mir.

–Roja 18'ê pûşperê, li Xozata Dersimê, di navbera gerîla û leşkeran de lihevxistineke dijwar qewimî. Di encama bûyerê de serbazek û 4 leşker mirin.

26.6.1995

Gerîlayên ARGK'ê, li Botan, bi ser Tabûra Aşût ve girtin. Di êrîşa gerîlayan de 15 leşker mirin. Piştî êrîşê di vekişîna gerîlayan de lihevxistinê dewam kir. Di encama vê lihevxistinê de jî 5 leşker û 4 gerîla mirin, 2 gerîla jî birîndar bûn.

–Roja 24'ê pûşperê, gerîlayan bi gulebaranê qereqola Teresa tacîz kirin. Piştî gulebaranê leşkerên derketin oparasyonê, li newala Terasiya ketin kemîna gerîlayan. Di kemînê de 10 leşker mirin.

–Hêzên dewletê di navbera Çiyayê Bestler û Çiyayê Bizina de ketin xefika gerîlayên ARGK'ê. Di xefika gerîlayan de nêzîkî 20 leşkerî mirin.

–Di 23'ê pûşperê de, li çiyayê Cûdî, gerîlayan êrîşî girekî ku leşker tê de bi cih bûbûn, kirin. Di cerda gerîlayan de 4 leşker mirin, gerilayan dest danîn ser malzemeyên cur bi cur.

–Li Mêrdînê, li warê Omeriyan û Bagokê operasyona hêzên dewletê didome. Li gorî agahiyan, di operayonê de heta niha tu şer neqewimî.

–Li Behdînan, gundên Keman û Begîjnî ji aliyê leşkeran ve hatin valakirin. Dîsa li Şemzînanê jî, gundê Şîve Kala û Tûyî hatine valakirin.

–Gerîlayên ARGK'ê, li Tûxê (Tatvan), li nêzîkî gundê cerdevanên Warir, du cerdevan dîl girtin.

27.06.1995

Di navbera Şirnex û Berwariyê (Pervari) de, li warê Garisa di navbera gerîla û leşkeran de lihevxistinên dijwar qewimîn. Gerîlayan di lihevxistinan de gelek car leşker xistin kemîna xwe. Di encama bûyerê de 10 leşker mirin, 2 gerîla birîndar bûn.

–Li Silopiyê, 2 endamên ERNK'ê, li nêzîkî gundê cerdevanê Xirişkinê ketin kemîna leşkeran. Di bûyerê de her du endamên eniyê mirin.

–Gerîlayên ARGK'ê, bi ser gundên cerdevanên Şişe ve girtin. Di cerdê de gerîlayan dest danîn ser gelek sîlah û cebilxaneyên cerdevanan.

–Li Şemzînanê, leşkeran ji ber cerd û êrîşên gerîlayan, qeraqola Harûna vala kirin.

–Di navbera Wan û Tûxê (Tatvan) de erebeyeke leşkerî li nêzikî gundên Birika û Engelser li mayîna gerîlayan leqitî. Di bûyerê de 10 leşker mirin.

28.06.1995

–Li Çiyayê Herekolê, leşker û cerdevan li nêzîkî Erişten ketin kemîna gerîlayan. Di kemînê de 2 cerdevan mirin, yek dîl ket destê gerîlayan.

–Gerîlayên ARGK'ê piştî bombekirina boriya ava Tabûra Rubarokê, cerdevanên gundê Şerbina xistin kemîna xwe. Di cerda gerîlayan de cerdevanek mir, yek jî birîndar bû.

–Hêzên dewletê li Sasonê (Qabilcewaz) gundê Mala Merge bi havanan bombe kirin. Di bûyerê de 3 gundî birîndar bûn.

29.06.1995

–Roja 28'ê pûşperê, erebeyeke leşkerî li nêzîkî Silopiyê li mayîna gerîlayan leqitî. Bi teqîna mayînê 10 leşker û başçavîşek mirin.

–Leşker li nêzîkî qereqola Xabûrê ketin xefika gerîlayan. Di xefikê de 7 leşker mirin, 3 leşker birîndar bûn.

–Li Şemzînanê, li dora gundî Terasur di navbera leşker û gerîlayan de lihevxistinek qewimî. Di encama lihevxistinê de 5 leşker mirin, gerîlayan zayîat nedan.

30.06.1995

–Roja 29'ê pûşperê gerîlayan riya Ertûş û Çelê (Çukurca) xistin kontrola xwe. Di kontrola rê de gerîlayan 5 cerdevan xistin binçav.

–Gerîlayên ARGK'ê êrîşî qereqola Erîşê kirin. Di cerda gerîlayan de 4 leşker mirin.

–Li nêzîkî gundê Xirbe More ku li ser Mahsertê (Ömerli) ye, di navbera hêzên dewletê û gerîlayên ARGK'ê de lihevxistinek qewimî. Li wir 10 leşker mirin.

–Li çola Pilêmorî di 29'ê pûşperê de di navbera leşker û gerîlayan de lihevxistineke dijwar qewimî. Di encamê de, 4 leşker û 4 gerîla mirin, 9 leşker jî birîndar bûn.

1.7.1995

Gerîlayên ARGK'ê li Qaqizmanê (Kağızman) li warê Geliyê Xecê hêzên dewletê xistin kemîna xwe. Di kemînê de 13 leşker û gerîlayek mirin, 6 leşker jî birîndar bûn.

Li nêzîkî Tabura Xaburê gerîlayan êrîşî leşkeran kirin. Di cerda gerîlayan de serbazek mir, 2 leşker jî birîndar bûn.

Di navbera gerîlayên ARGK'ê û leşkeran de li gundê Piyas ku li ser Pasûrê (Kulp) ye, şer derket. Di şer de 3 leşker mirin.

Li warê Habizbina ku li herêma Mêrdînê ye operasyona hêzên dewletê didome. Li gorî agahiyan firokeyên artêşa tirk li herêmê bêsekin bombe dibarînin.

Kurd–A/Welatê Me

LI WELATÊ XERÎBIYÊ KURDÎTIYA BÊKURDÎ

Stenbol, her diçê dibe wekî bajarêkî kurdan lê gelo zimanê kurdên Kurdistanbol, wê kengî bibe kurdî.

"Em ji ber mesajên politîk, mecbûr dimînin zimanê tirkî bi kar tînin", "Mêvanên ku tên saziyên me ji nîvî bêhtir bi kurdî nizanin, ji ber vê yekê têkiliyên me bi giranî bi tirkî ne", "Di nav weşanên me de kurdî sembolîk e", "Di civînên me de (ji şeş kesan yek bi kurdî nizanibe) em mecbûr dimînin ku bi tirkî biaxivin", "Hevalino îro bi tirkî nepeyivin, ji Welatê Me yek li vir e", "Gelek kes ji fediyan bi kurdî diaxivin", "Ji îro pê de emê dest bi axaftina kurdî bikin", "Ez bi kurdî baş nizanim, kurdiya me û we ne yek e, ma tu ji min fêm dikî?" Li bajarê Stenbolê nifûsa kurdan ji 3 milyonî bêhtir e, lê weşanên bi kurdî (rojname, kitêb û kovar) ji hezarî zêdetir nayên firotin.

Me beşek ji nivîsa xwe ya bi sernavê "Alo rojbaş, burası.." di hefteya derbasbûyî de weşand. Vê hefteyê jî beşê dawîn diweşînin.

Pirsa duyemîn, "Li gorî we di nav kurdan de kurdî wê kengî bibe zimanê her cure (şikl) têkiliyan?" bû.

RONAHÎ

Li gorî me sazûmanên bingehîn nehatine avakirin. Ev jî li pêşiya vê yekê astengeke mezin e. Ji bo ku kurdî di her cure jiyanê de cih bigire herî hindik 10 sal divê. Lê îro ji tirkî vegerek heye.

NÇM

Ziman jî beşek ji hêmanên neteweyê ye. Heta zimên nebe yê dewletê, nebe yê bazara aboriya neteweyî li her derê axaftin zor e.

DOZ

Li Stenbolê ev tişt ne mumkûn e. Hema hema hemû têkiliyên ticarî bi tirkî ne, ev tişt incax li Kurdistanê dikare bê kirin. Ji bo ku li der û dor her kes bi tirkî dipeyive, gelek kesên kurd ku tên saziyên kurdan, xwe mecbûr dibînin, bi kurdî diaxivin. Her hal ev psîkolojîk e. Problemek din jî, di navbera me û wan kesên ku bi zazakî dipeyivin de heye. Em mecbûr dimînin bi zimanê tirkî bipeyivin.

JIYANA NÛ

Ev tişt dikare bi perwerdeyiyeke navendî çêbibe. Li metropolên Tirkiyeyê zimanê kurdan, wekî li her derê dinyayê çêbûye, bi texmînî wê di têkiliyên nav kurdan de bi awayekî hindik bimîne. Em dikarin bibêjin, di nav rojnameyên hefteyî de ya ku pir cih didin zimanê kurdî em in. Gelek xwendevanên me, ji me re dibêjin ku ew ji nivîsê kurdî fêm nakin. Lê em wekî tewrekê, cih didin zimanê kurdî. Heta vê gavê daxwaza perwerdeyiya bi zimanê zikmakî wek tewreke reformîst hate nirxandin. Lê em dibînin ku ev daxwaz ne bi qasî serxwebûnê be jî, cihê wê pir muhîm e.

MEDYA GÜNEŞİ

Wexta zimên bibe zimanê perwerdekirinê, wê têkeve vî halî. Ev nayê wê maneyê ku em li benda perwerdeyiya li dibistanên resmî ne. Ev pirsgirêkeke neteweyî ye û bi kesekî du kesan nikare bê helkirin. Mesele avakirina sazî û dezgehan e.

Di vê nûçeya lêkolînî de pirsa me ya sisêyan, li ser "Ji bo ku zimanê kurdî di saziyan de û di nav însanan de bibe zimanê têkiliyan, tedbîr û projeyên we çi ne" bû.

RONAHÎ

Projeyên me yên bingehîn tune ne. Lê em hêdî hêdî bi der û dorê xwe ve dest bi projeyên bingehîn dikin. Xebata me li ser rojname û pirtûkan didome. Navendeke çand û hunerê nû dest bi xebatê kir. Ji bo zarokan xebatên pirtûkan hene. Dersên bi kurdî hene. Dema qeweta me bigihîje em dixwazin radyo û tv' yekê jî ava bikin.

NÇM

Armanca me ew e ku di Newroza 96'an de em êdî bi kurdî biaxivin, bifikirin, binivîsin û civînên xwe çêkin.

Nîşe: Beriya vê hevpeyvînê Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt di 25'ê pûşperê de dest bi kampanyaya kurdî kir. NÇM'ê jî, bi gelek saziyîyên din re li Tirkiyeyê û Kurdistanê di vê tarîxê de, dest bi vê kampanyayê kirin.

DOZ

Radyo, televizyon û derdor, çiqas pir bi kurdî bin, wê ewçend psîkolojiya me ya bi kurdî peyivînê jî pir bibe. Gelek caran em xwe mecbûr dikin an zorê didin xwe ji bo peyivînê. Ev nabe. Divê ev tişt bê hîskirin.

JIYANA NÛ

Em pirtûkan çap dikin. Em dixwazin xebatkarên me yên nû, bi kurdî baş zanibin. Hêdî hêdî em difikirin ku dest bi pêvajoyekê bikin. Divê derdorên kurdan, însanan jî teşwîqî hînbûna kurdî bikin.

Bi baweriya me, kêmasî ji neyekbûyina rêxistinên kurdan tê. Gava ew bên ba hev, wê ev astengî jî rabin.

MEDYA GÜNEŞİ

Ji bo vê meseleyê mirov dikare du tedbîran pêşkêş bike: Yek kurs, dudu di nav jiyanê de bikaranîna zimên. Mesela saziyên kurdan gava xebatkarek xistin kar, divê şertek hebe. Ew jî zanebûna xwendin, axaftin û nivîsandina bi kurdî be. Kesên ku nizanibin jî, di nav demekê de bi kursan, divê ew hînî kurdî bibin. Mirov dikare ji niha ve dest pê bike. Her tişt tercîh e. Zimanê tirkî her çiqas rehet be jî, lazim e em zorê bidin xwe.

NÛBIHAR

Du tişt li ser bikaranîna zimên tesîr dikin.

1–Îhtiyaç

2–Moral

Lazim e hêdî hêdî hin saziyên kurdan zorê bidê ku ziman bibe îhtiyac. Ev têra me nake. Ji me re psîkolojî jî lazim e. Siyaseta dagirkeriyê psîkolojiyek xistiye serê me ku zimanê me bi kêrî tiştekî nayê. Ev jî ji du aliyan dikare bê çareserkirin: Ji aliyê îhtiyacê ve tiştên îlmî û ji aliyê psîkolojiyê jî, şêrînî û eleqe lazim e.

Divê em li şaîr, nivîskar û ew kesên ku di vî warî de xebitîne, xwedî derkevin. Bi van teşwîkan wê baweriyek bi wan re çêbibe. Ji hêla din gava ew kes bi xwe beşdarî civînan bibin, wê karibin derdê xwe hê baştir pêşkêşî civakê bikin. Lazim e pêşbaziyên teşwîkirinê jî çêbikin.

Pirsa me ya dawîn, "Piştî avabûna televizyona kurd MED–TV, wê çi tesîr li ser axaftin, nivîsandin û pêşdeçûna zimanê kurdî çêbibe" bû.

RONAHÎ

Di pêşvebirina zimên de teknîk, fonksiyoneke giring dilîze. Mirov bi rojname û pirtûkan bigihîje 10 hezar mirovî, bi radyo û tv'yan digihîje milyon kesî. TV–MED'ê gaveke gelek mezin e û girîng e. Hêviya me ew e ku wê TV–MED teknîka xwe bi pêş ve bibe û elemanên xwe profesyonel bike. Ev her du tişt gelek girîng in. Em ji vir TV–MED'ê û xebatkarên wê pîroz dikin.

NÇM

Ji bo neteweyên dinê çawa dewletek serbixwe û neteweyî pêwist be, di dawiya sedsala bîstan de televizyon jî em dikarin bibêjin ku bi qasî îhtiyaca dewleteke serbixwe ji bo neteweyên dinê pêwist dibe. Em dikarin bibêjin televizyon ji bo avakirina dewleteke serbixwe gavek pir girîng e û qasî karên siyasî û leşkerî tesîrê dike. Lê di warê zimên de ev tesîr ji karê siyasî û leşkerî zêdetir e, heke baş bê xebitandin.

Bi rastî hînkirina zimên, pêşvebirina zimên tenê bi televizyonê nabe, mixabin lazim e ku li her bajarî, li her taxî dibistanên kurdan hebin, lê heke televizyon baş bê xebitandin, TV–MED li her malekê dibe dibistan ji bo kurdan.

DOZ

Ev pêwistiyeke gelek mezin bû. Ji bo zimanê kurdî îmkaneke pir mezin e, divê hemû kurd ji vê îmkanê zêdetir feydeyê bistînin. Ji aliyekî ve MED–TV wezîfeya hemû rojname û pirtûkan dike.

JIYANA NÛ

Problema me ya herî muhîm ew e ku em nikarin bi kurdî biaxivin. Ji bo vê yekê saziyên wekî TV–MED'ê wê rê li vê asîmilasyonê bigire. Salê mirov çend filmên kurdî seyr bikin, wê fikirîna bi kurdî jî pir bi pêş keve. Avabûna vê saziyê tiştekî pir muhîm e.

NÛBIHAR

Di dereceya ewil de me kurdî da pêş xwe. Ji bo hemû gelên ku saziyên wan tune ne û xwendin û nivîsandina wan bi şûn de maye, divê bi tenê karê nivîskî neyê çêkirin. Îhtiyaceke mezin ji bo van gelan ji radyo–tv'yan re heye. Divê xebateke şifahî (devkî) bête kirin. Ji bo pêşdebirina zimên wasitayên wiha lazim in. Lê belê radyo û tv têra vî karî nakin. Ji ber ku saziyên wiha ne pirdengî ne.

MEDYA GÜNEŞİ

Televizyon merheleyeke mezin e. Bayekî nû ye. Wê televizyon tesîreke pozîtîf li axaftina zimanê kurdî bike.

SUUT KILIÇ

LI BENDA MIRINÊ

Koma Xanî ya Çand û Wêjeyê, encama pêşbaziya kurteçîrokan di 3'yê tîrmehê de li Helebê diyar kir. Ji nav 26 kurteçîrokan xelata yekemîn, kurteçîroka "Li Benda Mirinê" ya Suud Kılıç stand. Xelata duwemîn Fewaz Ebdî bi kurteçîroka "Çira Pêncan" û ya sêyemîn jî M. Hemo bi berhema xwe ya bi navê "Hestir" stand. Mala Xanî, pêşbaziya ewilî ya kurteçîrokan di sala 1994'an de çêkiribû. Di vê pêşbaziyê de kurteçîroka Jan Dost "Xewna Şewitî" xelata yekemîn standibû. Mihrîcana xelatdayinê ya îsal wê di 20'ê vê mehê de li Helebê çêbibe. Em vê çîroka ku xelata yekemîn girtiye, pêşkêşî we dikin.

Ji bo bîranîna mamoste Seydo Aydoğan û yên wekî wî...

2 Rezber 1993 Amed

Teqqq.!?

Dengê sîlehekê bêdengiya vê sibeha zû, sibeha havînê xera kir. Pê re refeke çivîkan, ji ba dibistanê firiy. Qijînî bi çivîkan ketibû. Li vî bajarî dengê sîlehê, dengê teqînê, ne tiştekî ecêb bû. Lê, teqîna sibehê zû, ne bêsebeb bû.

Tîrêjên rojê xwe nû avêtibûn ji derve. Lê dîsan jî germiyek hebû. Germa havînê ne tenê di qiyala nîvroyan de xwe rê dida, lê belê, ji sibehê zû dest pê dikir. Tîrêjên tûj, hênkaya berbangê difûrand.

Xeber zû belav bû; mamosteyek hatibû kuştin. Ne yê ewilî bû û ne jî yê dawîn... Mamosteyê dibistana seretayî hatibû kuştin, bi guleyekê, wekî her carê.

***

Hundirê qehweyê ji vexwarina cixareyan, di bin dûxanê de dinaliya. Lîstika kaxezan û ya okeyê, guh bi mirov ve nedihiştin. Guh tenê, mejî dibû wek hêka dulme. Çayên germ, qedehên vala, xwelîdankên avis, çavên sorbûyî, şûşên coca cola yên bejnzirav, dibûn xemla qehweyan.

Li maseya ber camê, teq-reqa okeyê bû. Ji nav teq-reqê carinan çend peyv difilitîn: "Mamoste... Wê çawan be... ji paşiyê..., wek her..... bi guleyekê..."

Di nav vê hengameyê de mêjiyek, mêjiyê Cemil dudiliya xwe li neynika xeyalan nexş dikir. Ji aliyekî ve okey û ji aliyekî din ve jî, "...ji paşiyê ve tê û di dest de demançeyek, dilezîne, bi guleyekê û ji pişt ve, bi xayintî..."

Cemîl, xwe zû bi zû ji vê xeyalê bi dûr xist û bêhtir bala xwe da lîstikê. Ji nîvro ve ev çend maht, wî jî nizanibû.

Sibehê zû karneyên zarokan dabûn wan, lê bi çi halî. Ji ber ku serê sibehê mamosteyek, ew jî bi niyeta dana qarneyan dihat dibistanê. Mamostetiya wî, ketibû sala duduyan. Wê bi vê rojê, kêfa gelek zarokan bianiya. "Çiqas zarokên wî hebûn li dibistanê! Ha, birra li mal jî yek zar...,..." Xweziya Cemîl, di qirika wî de mabû, kela girî ketibû çavan. Bêhemdê wî dîsan hişê wî çûbû cihekî din. Dikir nedikir, nikaribû bi ezê xwe yê din. Jiyan, bi tenê ne tiştê li ser rûyê erdê, li ber çavan bû; xeyal jî hebûnek bû, hebûna daxwazên nedibûyî bû. Lê, niha tiştê ku dihatin hişê wî, ne xeyal jî bûn. Wî jî nizanibû, bê ka bi rastî jî ev çi ne. Gelek kes li ser van cinayetan dipeyivîn, lê ji aliyekî ve jî dilê wan dikir dipedip. Li derdorê însanan ji vî şeklê mirinê re navek jî dîtibûn, "mirina bêwext!"

Piştî lîstika bi hevalên xwe re Cemîl jî li sûkê, lazimiya mal, alav- malav kirî. Atmosfera ku di sûkê de hebû, mîna ya qehweyê bû; mirov di sûkê de bêhn nedistand. Çavên ku hevdu taqîb dikirin, bi bêbaweriyeke bi tirs, hilma destan bêhn dikirin.

"Destê xayin, mirov ji ber wan fedî dikir", digot Cemîl, "Çawan dikarin ewqas bêwijdan bin."

Di dilê Cemîl de pirsek derbas bû. "Gelo ez bi tenê di vê tas û wasê' de me?" ji xwe re got. Gava vegeriya malê, jina wî wekî her carê li hêviya wî, dest li ber, sekinîbû. Bi çavan merama hevdu fem kirin. Mîna wexta dilketibûn hev jî, dîsan bi çavan daxwazên xwe di spîka çavên hev de anîn zimên.

Wê çaxê Cemîl, nû bûbû mamoste û hesabên wî yên li ser jiyana pêşerojê hebûn. Roja ku dibistana mamostetiyê qezenc kiribû, Ezîza hîn zarok bû. Di nava du salan de Ezîza bûbû qîza ber zewacê. Sala zewaca wan a ewilî, di wan şevên zivistanê de bi Ezîza re gelek roj derbas kiribû, ew roj niha wek xeyaleke ku Cemîl hê nejiyaye, li ber çavên wî dibihurî. Wê salê Cemîl, ji gund her roj diçû dibistana bajêr, mamostetî dikir. Ezîza carinan di nava peyvê de digot: "Maleke me ya xweşik li bajêr hebûya û taximeke qoltixan jî tê de bûya, emê yekcarî ji vê toza gund xelas bûbûna." Lê daxwaziya Cemîl, tiştekî din bû. Hêviya welatekî azad dikir, lê çawan, wî jî nizanibû. Bi saetan qala vê meseleyê ji Ezîza re dikir.

Piştî 12'ê îlonê ev hêvî jî, bi hawakî ji Cemîl re bûbû xewneke jibîrkirî. Ew jî di nav de, gelek hevalên wî hatibûn girtin. Lê, bavê wî, ew bi naskirina nasên xwe, dabû berdan. Cemîl ji bo vê berdanê heta demekê ji ber hevalên xwe şerm dikir.

Li ser şîvê Cemîl bêdeng bû û dilê wî li xwarinê venedibû. Bi zarokan re jî wek her car, mijûl nedibû û xwe teslîmî binhişê xwe kiribû. "Berî vê bûyerê jî gelek kes, bi vî şeklî hatibûn kuştin. Gelek zarokên bavan, xwîna sor li ser kevirên riyan, rijandibûn. Pelên daran sawa xwe digirtin, dîwarên sikakan hifza xwe dikirin bi çavvekirî. Wê çawa ew, ji vê tirsê mehrûm bimaya? Zarokên bavan, ne yên diyan, li ser piyan, di riyê goristanan de, bi kefenekî spî, kefenekî bêbêrîk ku karibûna hêviyên xwe têxistana cihekî û bi xwe re bibirîna, bibirana tariya bêdawî."

Wî di cihekî de xwendibû ku doktoran lêkolînek li ser kesên di sêkiratê de çêkiribûn û tesbît kiribûn ku di wî halî de dengek, dengekî muzîkeke giran tê wî kesî. "Muzîka mirinê hebe", digot Cemîl, "wê ev be. Ew zarokên bavan, di kefenên bêbêrîk de, bi vê muzîka giran û bi hêviyên nîvcoyî, xatir ji me dixwazin. Lê, destên wan girêdayî ne, wê çawan xatir bixwazin? Mirin, bi xwe re xatir xwestinê jî dibe." Heta niha, wî çiqas rêwî bi rê kiribûn. Gelo ewê jî bibûya rêwî? Fikrek tirsonek û zû dihat jibîrkirin. Bi vê jibîrkirinê Cemîl têdigihişt ku ew her roj hejmara rêwiyan jî ji bîr dike. Jiyana wî bi deqeyan dihate guhartin. Jiyaneke rojane dijiya, xwe di doh de ji bîr dikir û êdî doh li dû mabû. Ji ber ku sibehê wê bi bûyereke doh, têxista deftera bîranîna hişên jibîrkirî.

Di mêjiyê Cemîl de ewqas fikr hebûn, lê yek ji wan bi serê xwe, ne tiştek bûn. Serî hebû, laş tune bû. Laşên bêserî wek teriya maran, li bin guhê vî dîwarî diketin û li bin guhê wî dîwarî diketin. "Serîkî qulkirî, porê şehkirî..!" Bi tenê tiştên ku li dû miriyekî di serê wî de diman, ev bûn. Ji bilî van peyvan atmosfereke bêreng bi mijûliyekê ve di serê wî de peyda dibû, "Reşbelek mijek tarî; bêhna bêdengiyên şekalên tirsonek, nigên ricifandî di kûrbûna koncalê tirsê de bêmecal dihiştin. Mijên bêreng, kelemê çavan bûn ji bo dîtina rastiyan. Lê çavên tirsonek, ava reş bi ser xwe de dadikirin, dibûn korê rastîdîtî. Serên şûştî, ku bi sabûna Helebê paqij dibûn, hew hilma guleyan bêhn dikirin. Gul bûbûn qîvar ji bo....." Cemîl dikir nedikir ji binhişê xwe derfeta derketinê nedidît, "Gelo ev kesên ku bi gavên tirsonek ji pişt ve dihatin kî bûn? Ma ew jî ne ji me bûn? Belkî lawê cîranê min be jî. Kuştina 'xwe bi xwetiyê', yê dikuje jî ez im û yê tê kuştin jî ez. Lê ez jî dizanim ev gotin têrî şîroveya meseleyê nake ." Wî bihîstibû ku berî niha bi demekê, li qeza cîranê wan bavekî, lawê xwe kuştibû. Ji ber ku ew law, bûbû qatilê gelek kesan. Rojekê bav, bang li lawê xwe dike û jê re dibêje: "Lawo; te em rezîl kirin. Heger ez te nekujim, wê xelk te bikuje. Tuyê bibî hestiyê na'letmê." Û dûv re bi yek guleyekê qapaxa eniya lawê xwe difirîne.

Di nav ciyan de Cemîl, nedixwest bipeyive. Lê, Ezîza dixwest çend peyvan ji mêrê xwe bibihîse. Belkî dilê wê, hinekî rehet bibûya. Ew mecala peyvê, bi Cemîl re tunebû. "Na na, bi rastî ez niha qala çi bikim? Tiştekî nexuyayî tunebû. Yekî şazdeh-hivdeh salî, demançeyek di dest de, an sibehê zû di çûna kar de, an jî êvarê di derketina kar de, ji paşiyê, bi gavên tirsonek digihîje nêzîkî wan û bi dengekî bang dike, dibêje: "Felan kes!" Piştî wê jî bi derbekê..., bi gul-eye-kê, jiyanekê, ku bi salan ji hêla bav û dayikekê ve hatiye honandin, bi dilopeke xwînê di-ku-jin! Ev yek, ne çîroka 'Kê kuşt, min kuşt' bû jî. Kê kuşt, kê kuşt? Kêêê kuşt? Ha ho hewarê kê kuşt delalê dilan?" Çavên Cemîl mişt hêstir bûbûn, wijdanê wî dev jê nedigeriya. Wek ku yekî şazdeh-hivdeh salî li pey Cemîl bû û ew di bin hişê wî de jî taqîb dikir.

***

Çend roj di ser bûyera kuştina mamosteyê dibistana seretayî re derbas bûbû. Di cenazeyê wî de jî gelek bûyer, gelek mirin çêbûbûn. "Yek, bi xwe re çendan dibe. Gelo ewê tê kuştin, gava ku wê zanibe bi wî re hewqas însan herin, bê niha çiqas aciz dibe. Çend roj derbas nabe", digot Cemîl, "wê dîsa yekî din, di ronahiya rojê de li ber çavên vekirî, lê nabînin, bê kuştin." Carinan di gengeşiyê de hevalên wî, yên çiyê rexne dikirin û digotin: "Ma çima çareyekê ji vê meseleyê re nabînin?" Bi piranî jî Cemîl ew rexne dikirin. Şer ne çare bû, li gor wî. Lê, di mêjiyê xwe de jî tu çareserkirineke têkûz, nedixist şûna vê metodê. Rojekê, hevalekî wî jê re gotibû: " Ma ev bûye pazdeh sal ku tu doza vê meseleyê dikî, lê heta vê gavê te çi gav ji bo xelasiya vî xelkî avêtiye. Ên ku diçin çiyê, di emrê zarokên te de ne." Ev gotin pir li zora Cemîl çûbûn û hew dixwest gelekî têkeve gengeşiyan.

Ew vê mehê jî wek mehên din ketibû derdê teqsîtên texsiyê. Ji ewiliya emrê xwe de, daxwaziya wî ya herî mezin, bûbûya xwediyê texsiyekê û bi kêfa xwe, wê biajota. Wexta Ezîza jî di kêleka wî de bûya û biçûya gund, li ba dê, bav û gundiyên xwe, wê gelek qîmeta wî çêbibûya. "Ji ber ku li gund xelk qîmetê didin malê mirov" digot Cemîl. Di zaroktiya xwe de carekê texsiyek dîtibû. Pir nedihat bîra wî, bê ka marka wê çi bû. Heta wê wextê pîrika wî di çîrokan de qala tiştê wiha dikir. "Lê ew tiştên ku di çîrokan de hebûn, ne wek ên vê wextê bûn. Di çîroka 'Cariya Sosinan de hespê Mihemed ê ji textikan hatibû çêkirin, wek teyareyên vê wextê, li gorî dilê Mihemed difiriya, diçû warekî din. Mihemed, boxriya hespik badida û bi hewa diket. Carekê jî li nav bahrekê giravek dîtibû û li ser wê giravê jî qesrek hebû. Di wê qesrê de 'Cariya Sosinan' rûdinişt. Wek kara xezalan xweşik bû. Mihemed jî ji eşqa wê, hero-duro bi hespikê xwe diçû li ser qesrê datanî û..."

Dîsa bêhemdê xwe çûbû dinyayeke din. Ev xeyal, xeyalê bi roj, ji Cemîl re wek xulmaşiyek xewê dihatin dîtin.

Cemîl, xwe bi xwe digot: "Di havînan de jî mirov ji xeynî xewnan tu tiştî nabîne." Dibistan ketibûn tahtîlê û lazim bû ku ew jî biçûna cihekî gerê, wek ber bahrê. Lê ji ber deynê texsiyê, wî nikaribû gava xwe biavêta cihekî din. Cemîl her bi xwe re dipeyivî, "Ê ku jinê wan wek wan mamoste bûn ya jî xwedî wezîfe bûn, wan bi rehetî îdareya mala xwe dikirin û nediketin van zehmetiyan." Çi fêde jina wî gundî bû û bi tenê dibistana seretayî qedandibû. Lê ehlaqê wê xweş, binamûs bû. Ma gelo li ser eniya wan dinivîsîne ku ê bi wezîfe çawa ne, baş ya jî xerab?" Gava li cihekî ji vê meseleyê bihata behskirin jî Cemîl, fikrên xwe bi vî hawî bilêv dikirin û xweziya xwe bi van gotinan dianî zimên.

***

Jiyanê ew pir guherandibû, ji zaroktiya wî ew gihandibû gehînekeke din, yeke bilindtir. Mirov, her tim xweziya xwe bi zaroktiya xwe tîne. Fikr û xeyalên zaroktiyê gava di jiyana pêşerojê de li dîwarên qalind ên rastiya jiyana rojane dikevin, pê re diçilmisin, di mijara xwe de demeke monoton dibuhirînin. Lê hewce bû ku mirov pêwistiyên roja xwe bi cih bianiyana. Ev fikrana piştî kuştina mamosteyê dibistana seretayî bêhtir, belkî jî cara yekem bû, ku serê Cemîl meşxûl dikirin.

Li malê, ev çend rojê wî bûbû ku ji rûniştinê û ji kesnedîtinê aciz bûbû. Ezîza nedixwest ew derkeve sûkê, biçe qehweyê. Ji mêrê xwe re digot, "Hema kaxetê xwe û okeya xwe bîne, ez û tu bilîzin, wisa bihesibîne ku ev der qehwe ye." Lê Cemîl bi vê yekê qayil nedibû û di hundir de nedisekinî. Ezîza jî nikaribû bergî lê bigirta lê 'dil tê nedibuhirî.'

Ezîza lê nêrî ku wê Cemîl biçe qehweyê, xwest

Ç A N D - W Ê J E

hem ber dilê xwe xweş bike, hem jî piçekî dilê Cemîl rehet bike,"Ma va bûye serê pazdeh salan, te çi kiriye? Ew jî herkesî, bêsebeb nakujin, wê ji bo çi kesê hayimtayim bikujin?" Ev gotinana, ber bi serê Cemîl jî hinekî diçûn û ji xwe re digot, "Ezîza rast dibêje. Carina li qehweyê û carinan jî li civatan ez dipeyivîm, lê tiştekî wa tûj min negotiye. Wele carinan jî ez diçim ta'ziyan. Hewqas kes sekinîne, wê rabin berê xwe bidin min, ji bo çi, min tiştekî ber bi çav nekiriye."

Gava ji mal derket, ji germa nikaribû çavên xwe vekira. Deh-panzdeh deqe bi meşê, di bin rojê de wê bimeşiya. Heta bigihîşt qehweyê, wê ji xwêdanê biba av. Her ji bîskê li dû xwe dinêrî, ev nêrîn ne ji wî tenê re bûbû edet, lê belê ji cergiya ku ev bûyeran destpêkir û bi vir de, ji xelkê giştikî re bûbû edeteke nû. Herkesî ji hev şibhe dikir. Yekî carinan bêhemdê xwe de[illegible] xwe radikir, hema pê re gelek kesan xwe dixistin refleksa parastinê.

Li qehweyê Cemîl, dîsa çû cem maseya ber camê. Ew tiştê wî dikişand qehweyê, ne kaxet bû û ne jî okey bû. Bi tenê, hêlma hevalan û hevdûdîtina însanan bû. Belkî sohbetek, belkî jî agahiyek ji bûyerên ku di rojnameyan de tunebûn, bû. Cemîl ji bo vê hatinê digot, "Her ku mirov tê vir, kurmê xwe li vir dişkîne û pişt re diçe mala xwe. Vir bûye wek cihê stresnavêtinê". Ne dixana cixareyan ne jî dengê pir ê guhê mirov kerr dikir, ji hatinê re dibûn asteng. Carinan dibû ku, li aliyekî xwarina xwe dixwarin û li aliyekî jî lîska xwe dilîstin. Ku navberek diket nav lîskê, qala xeber û bûyerên wê rojê dikirin û şîroveyên cuda cuda, li ser van bûyeran dihat kirin. Mamosteyê lîseyê Mihemed, wek her car dîsa qala qewimînên herêmê kir û li gorî xwe ew şîrove dikirin. Rewşa welêt pir nexweş bûbû, ev yek ji hêla herkesî ve dihat gotin, lê kesî baş nikaribû şîroveyek berfireh bikira. Ji ber ku rojev, roj bi roj dihate guherandin. Di nav vê guherandinê de helbet mirov jî dihatin guherîn. Cemîl jî êdî ne Cemîlê berê bû. Ew jî hêdî hêdî dihat guherandin, rexneyên tûj, wek berê li şervanan nedikir. Munaqeşeyên berê pir nemabûn, lê di nav însanên welatparêz de bi hev baweriyek tunebû. Hînê jî dubendî di navbera hêzên welatparêz de hebû, ev yek jî dibû sebeba xeman. Di dilê Cemîl de jî xemên wiha hebûn. "Alîkarî, bi tenê ne ji bo hinekan e. Lê belê berî hertiştî ji bo xwe ye û ji bo vê yekê ye jî berê tekoşînê xuya ye. Ji ber ku dijmin nabêje tu felan kes î û yê din jî felan kes e. Li kurdbûnê xwedîderketin bes bû ji bo wan." Ev gotin wek fikrek jiberkirî di mejiyê Cemîl de diçû û dihat.

Jiyan wek avê her berdewam bû û li benda mirovan nedisekinî. Mirov carina bi ber bayê bûyeran diket û xwe di atmosfereke jiyanê, yekî nû de didît. Ev şertên nû, gelo wê jî têxista atmosfereke wiha? Dudiliya mejî ne wek ya dil e. Mejî carinan hinek tiştan qebûl bike jî, ew rojên bihurîne û hatine jiyandin, nikare dilê tirsonek zû bi zû, ji elimandinên wî bi dûr xîne.

Cemîl, di nav vê muhasebeya ezê xwe û dudiliya xwe de rojek din buhartibû. "Rojên ku di jiyana mirovatiyê de bêşop û bêreng. Herkes wê rabe berê xwe bide zindana xwe" digot Cemîl. "Zindanên şexsî, lê bi jin û bi zarok." Xaniyê wî û yê mamosteyê lîseyê Mihemed, li eynî meheleyê bûn. Ji bo vê yekê wê pev re biçûyana malê. Ji aliyekî jî kêfa Cemîl dihat, ne bi tenê bû. Lê gava ji qehweyê derketin, li ber deriyê qehweyê hevalekî mamoste Mihemed, ew li devê derî dîtin û ji bo dîtina hevalekî bir cihekî din. Cemîl mabû bi tenê û dixwest xwe zû bi zû ji vê psîkolojiya bitenêbûnê derxîne. "Tê bê qey heta îro yek bi min re diçû malê. Bi serê xwe li vî bajarî ma, ger qedexe bû?" Lê Cemîl baweriya xwe bi vê fikrê ku ji bo dilê xwe teselî bike, neanî. Ro li ber ava bû, belediyê wek her car îro jî nav bajêr av dabû. Bêhna axê, li pozê mirov dixist û pê re kêfxweşiyek li rû belav dibû. Di kêleka rê de meş, ji qelebalixa însanan bêîmkan bû. Cemîl, ji nişka ve li dû xwe tiştek hîs kir û di zena wî de wek yekî ew taqîb dikir. Lê ji aliyekî ve jî nexwest bawer bike û, "Di nav vê qelebalixê de kî wê min taqîb bike" digot. Hişê wî wek zîzokekê di serê wî de digeriya. Her çiqas xwe hinekî teselî kir jî, ji heyecanê hew tiştek bi rê dixist. Xwêdan wek zîpikê ji eniyê dibariya ser çavan û pê re lê sar dibû. Lê meşa xwe jî bêrawestandin domand û nedixwest bawer bike ku yek wî taqîb dike. Nigên wî çend caran li ber wî xwar bûn, çogên wî fisiyan. Dusê caran li paş xwe nêrî, lê ew xortê ku li pey wî dihat, niha nexuyabû. Xwe bi xwe got, "Ez ji xwe re tiştan çêdikim, evana giş, ji ber xeyalên ku bêyî îradeya min di serê min de çêdibin, derdikevin holê. Çi tiştekî nexweş? Ez naxwazim van tiştan bifikirim, lê ji nişka ve ez xwe di çivanekê xeyalan de dibînim."

Cemîl, ne ku nefikirî, lê îhtimal nedayê ku ew kesê li dû xwe dîtibû, belkî jî ji bo mamoste Mihemed, bera pey wî dabû. "Gelo" digot, "ev kes ku ji bo Mihemed hatibûya, wê çawa me ji hev veqetanda, nas bikira? Lê, ma gelek kes bi vî hawî, bi şaşî nehatin kuştin? Ji bo vî hawî ye ku yê wê bête kuştin, bi navê wan têne bangkirin û gava ku vedigerin, bi devançekê, ji dusê metran bera 'serê' wan didin."

Her diçû nêzîkahî li mal dikir. Ro jî êdî winda dibû, lê hewayek pir xweş li derve hebû. Di dilê xwe de gerek peyatî bi Ezîza re li ser riya paş gir, derbas kir. Pê re sikaka ku mamosteyê dibistana seretayî tê de hatibû kuştin, bi ber çavên wî ket. Binhişê wî serî jê stand û ji hêrsa, xwe winda kir. Xwe di nav gelek dengên xerîb de didît û wek dîrokzanekî hawirdor didarizand, "Ev dîwarên bêçav û bêdeûy, niha çav û devê we heba, bê weyê qala çend kuştinan bikira? Ezmanê çav şîn, çavê xwe megire, li nezera erdê binêre, binêre ku bêbextiyên ecêb, di quncikê dîwaran de, ku dîwar ji bêdengiya xwe fedî dikin, di wijdanê tune de, tên kirin. Ax û dar, jitiyê. Piştî bêdengiya mêraniyê, bi tevayî sirûştê jî deng nedikir. Çi ji wê re lazim bû ku xwe têxe nav xayintiyên mirovan. Êdî bêdengî bûbû deng û rengê jiyanê, jiyana merezdarî. Yek ji van mirovan jî gelo ne tu bû ku gazin ji dar û axê, ji hawirdor dikî, hawirdora bêdev?" Di serê Cemîl de tê bigota qey Cemîlekî din heye ku van fikran bi Cemîl dide peyivandin. Her çiqas wî ev fikr nedecibandin jî, wek rastiyeke giran ketin ser dilê wî. Xwest xwe zû bi zû ji vê psîkozê derxîne û bi dengekî nizm xwe li hemberî xwe parast, "Li vê deverê jiyan jî ji gavên xayin û tirsonek ditirse; wê çawa rebenê Cemîl xwe neparasta!"

Bi çi hawî jî be, xwe gihandibû cem deriyê hewşa mala xwe. Êdî bi rehetî dikaribû bêhnek bistanda, bêhnek kûr. Birçîbûnê jî dabû dilê wî û ji birçîbûnê pê ve tu tişt ne di bala wî de bû. Destê xwe avêt deriyê hewşê ku veke, dît ku yek li dû wî ye û bi dengekî tirsonek bangdike. Ewilî fêm nekir ku dibêje çi, lê cara duduyan dengê Mihemed û dengekî din, pev re hatê...

"Teqqq."

***

Ji dengê zarokan û yê televizyonê, tu deng nehatibû hundirê odeyka rûniştinê. Ji mûtfaxê Fatma hat kete devê odekê û bi dengekî hêl bang kir, "Huskun kuro, Xwedê we nehêle, we nehişt em rojekê bi rehetî li vê malê rûnin." Bi van gotinan mêrê wê Ahmed jî, li xwe hay ket û li Fatma nêrî. Fatma peyva xwe dirêj kir û ji Ahmed re got, "Te ev zarok li serê me har kirine. Ne tu rojekê bi wan re dixeyidî û ne jî tu li wan dixî. Wek bavekî, te dilê min li wan rehet nekir."

Ahmed, ji qoltixa ku lê rûniştibû xwe hinekî rast kir û bi gotineke nerm bersiva Fatma da, "Te xêr e lê, tu dîsa ji zarokan çi dixwazî?" Bi peyva bavê wan, zarokan guhê xwe li gotinan miç kirin û li cihê xwe bêdeng rûniştin. Fatma, berî niha bi çend deqa dengê sîlehekê bihîstibû û dixwest ku vê yekê ji mêrê xwe re bibêje. "Niha ji derve dengê sîlehekê hat, min dixwest ku ez vê bibêjim. Heke ne ji dengê televizyon û zarokan bûy, wê deng bihata te jî."

Ahmed, bi vê gotinê re hinekî din jî xwe rast kir û hêdî hêdî ji qoltixê rabû ser xwe. Li meheleyê ji dengê însanan xuya dibû ku yek hatiye kuştin. Bi bihîstina meseleyê, Ahmed xwe bera ser qoltixê da. Giraniyek kete ser dilê wî û bi rehetî bêhn nedistand. Zîpikên xwêdanê li ser eniya wî civiyan. Hin ji wan zîpikê xwêdanê di cihê xwe de diman û hin ji wan jî xwe ji terkên eniya wî bera jêr, ser rûyê wî dan. Rengê rûyê wî vêre qelibî û çavên wî di kortikên xwe de bê lebat sekinîn, wek ku hinek herdu reşikên çavên wî di cihekî de bizmar kiribe, sar sar li valahiyekê dinêrî. Dengê Fatma, êdî wek piste pistekê dihatê. Di nav şevreşiyekê de, ji dûr ve bayê dengekî xwe digihandê. Ev deng, jê re ne xerîb bû, lê baş ne diyar bû jî, "Vê êvarê deriyê kê dîsan hat girtin? Yek bi yek têne neqandin. Gelo vê carê dora kê ye?" Ahmed, di nav fikran de diçû û dihat, lê dengê Fatma, ew ji xewa fikran şiyar kir, "Hela rabe ser xwe lo, here bê kî hatiye kuştin?.."

22 Kewçêr 1994

SUUT KILIÇ

www.arsivakurdi.org

"Welatê min bi çar alî bi kesk û sor û zer xemilî wa azad dibe Kurdistan neyar tu yê ji kerban bimirî"



Merheba zarokino! Hûn zanin îro zarokên li Kurdistanê bi çi awayî dileyizin û di van lîstikan de çi diaxivin? Belê zarokino li Kurdistanê şer heye û di vî şerî de aliyek şerê azadiyê ye, aliyek jî neyarên xwînxwar in. Ev şer duwazdeh sal in dom dike. Zarokên Kurdistanê jiyana xwe di nava vî şerî de didomînin û ew jî ji bo azadiyê welêt têkoşînê dikin. Li her deverê dinyayê lîstok û lîstikên zarokan wek hevdû bin jî, li Kurdistanê ne wisa ne. Zarokên kurdan di nava vî şerî kirêt de ne, lîstikên wan jî ne wek lîstikên zarokan in. Lê zarok li her deverê zarok in û di nava şer de bin jî, bi tank û topan werin kuştin jî, ji lîstikên xwe şûn ve namînin.

Li Kurdistanê zarokan hinek lîstik guherandine û di lîstikên xwe de jî li hemberî neyarên hov disekinin. Di lîstikên xwe de ji dêla fîtok, bend û totkanan, an dêla bebeg û mîsketan bi guleyên neteqandî, bi tankên ku hatine şewitandin dileyizin. Di lîstikên xwe de li ser şerên azadiyê û têkoşîna neteweyî ya Kurdistanê dipeyivin. Zarokino birastî ew yek caran tiştên wisa diaxivin ku mirov bawer nake ku ew zarok in. Salên wan û bejnên wan biçûk bin jî, gotin û fikrên wan pir mezin in.

Hûn jî dizanin yek caran jî di rojname û tv'yan de dibînin, zarokên kurdan çawa di pêşiya serhildanan de ne. Leşkerên romê bi guleyan û bi tankan êrîş dikin, zarokên kurd bi keviran bersiva wan didin.

Li gundekî Kurdistanê zarokan dilîstin û dema çavê min li wan ket ez çûm nêzîkî wan û min li wan guhdar kir. Bi giloverî kom bibûn û her carê yek ji wan dihat ortê, hestorik digot an axaftin çêdikir an jî xapînokek dipirsî. Mezinên wan deh salî bû. Zarokino bawer bikin, axaftinên wan ên wek mirovên mezin bûn. Gulê şeş salî bû, her carî bi stranî hejmar çêdikir û navê kîjan zarokî bigota ew dihat navbera zarokan. Gulê hejmar bi vî awayî digotin:

"Suwar bû li kerê,
çû bênderê,
av vexwar neda kerê,
da dû te mişk û maran
arvanê karan
îcar dora kê.

û li çavên hemû zarokan dinêrî û hestiroka xwe didomand.

"Weyso derket
Binevş derket
ma Çûrê."

Çûrê hat ortê, hinekî şerm kir, lê ji dûr ve:

"Hevalino ez ji we xapînokekê dipirsim?
Çiya û zozan dimeşin
neyar ji ber wan dikişin
wek şêr in qet natirsin
kî ku zane, navê wan bêjin?"

Dema Çûrê xapînoka xwe qedand, hemû zarokan bi hev re bersiva wî dan. Bi dengekî bilind gotin "Gerîla ye." Gulê dîsa hejmar çêkir û îcar jî Xemgîn anî ortê. Xemgîn hinekî fikirî û got "Ezê jî ji we re hestirokekî bibêjim."

"Welatê min bi çar alî,
bi kesk û sor û zer xemilî,
wa azad dibe Kurdistan
neyar tu yê ji kerban bimirî."

Dema Xemgîn hestiroka xwe qedand, hemû zarokan bi hev re wekî ku sloganan bavêjin sê çar caran "Neyar tuyê ji kerban bimirî" gotin. Gulê îcar jî dor da Silto. Silto seqet bû, lingekî wê di serhildana Newrozê de ketibû binê totkannê tanka romê. Zarokan ji Silto pir hez dikir, dema ew hat navenda wan, jê re pir li çepikan xistin. Silto hîn neh salî bû, lê axaftineke wisa kir ku ên ku ji dûr ve guhdar bikin ewê bêjin ew partîzan e diaxive. Di dawiya axaftina xwe de wisa got:

"Ne ji tîman ditirsim, ne jî ji kontrayan. Di destê min de kevir heye û ez tim li pêşiya raperînan im. Ez zarokê kurd im, serbilind im."

Silto bi can û dil digot peyvên xwe. Min ji gundiyan bihîstibû dema leşkerên romê êrîşên gund dikin, hemû zarok xwe li taldeyan vedişêrin û keviran davêjine wan. Lê Silto bi eşkeretî li xopana gund tûyî nava çavên leşkeran kiriye û pirsên xerab gotine. Lîstika zarokan wisa dom kir, lê ez pir dilxweş bûm. Zarokino jiyan û mirin her dem bi zarokên Kurdistanê re ye, lê ew bêtirs û bêxof in.

Zarokên wî gundî nediçûn dibistana tirkan jî, ji ber ku di gundan de dibistan nemabûn. Leşkerên romê dibistan şewitandibûn, lê rojnameyên tirkan nivîsandibûn ku gerîla dibistan şewitandine. Zarokên wî gundî hefteyekî şûn de êdî nikaribûn li ber devê çem bileyizin. Silto pêşî bêling mabû, niha jî gundê wî tunebû. Neyar ji ber hevalan ketibûn tengasiyeke mezin, ji vê kerbê hatibûn gundê Silto şewitandibûn. Belê zarokino zarokên Kurdistanê bêlîstik, bêdibistan û yek caran jî bêdê û bêbav dimînin, yek caran bêmal û gund jî dimînin.

ROTÎNDA YETKÎNER

NAMEYÊN XWENDEVANAN

Heydê kedkarino

Tekoşîna azadiyê ev rastiyên ku bi hezar salan e bi derewan hatibûn nuxamtin, derxist holê û li ber çavan dan raxistin. Parlemento, TV–MED û saziyên neteweyî bi xêra tekoşîna azadiyê hatine bi destxistin.

Li hemberî vê misogeriyê, komara tirk bêalternatîf maye. Çillerê di kaneleke televîzyonê de wiha digot: "Bila kes ji me çareseriya siyasî nexwaze! Lewre çareseriyeke me tuneye." Di van gotinan de baş xuyaye ku dest û pê li komara tirk bûne girêkorêk ji vî şerê qirêjî pê ve naxwaze tu tiştî bifikire.

Der barê pirsgirêka kurdî de, karbidestê tirk jî wek rayedarên dewletê, bîrdoziya fermî napejirînin. Çareseriya Împeryalîstan di parêzin, gere çewt neyê fêm kirin, tiştê ku Împeyalîst diparêzin tev ne derew in hinek jê rast in û gere em van rastiyan bibînin (Împeyalîst van rastiyan ji dil naynin ziman)

Di vî şerê qirêjî de sermayêdar jî zerarê dibînin. Lewre nirxê ku tenê afirandin di nav şerê qirêjî de tenê herimandin.

Komara tirk ji bo ku kêçekê bikuje, lihêfan dişewitînin. Bila ji bîr nebe ku ev lihêf bi keda kedkaran hatiye çêkirin.

Bêjeya "Haydî Tirkiyê" em diguherînin û dibêjin –Haydê kedkarno– lihêf dişewite, lê xwedî derkevin, serî bi qurbana lingan bikin.

Bimînin di xweşiyê de.

Bi silavên şoreşgerî.

M. Ali Mutlu
Meletê

Birûskên azadiyê

Heval û xebatkarên rojnameya Welatê Me, pîrozkirina we barê stûyê me ye. Spasiyên me jî, berhemên hilbirînên we ne. Bi saya serê we "digel şaştî û çewtiyan wişe û risteyên me" em dikarin binivîsin ango hîn dibin. Jî zagonên xwezayê ne: Di her zayîn û guhertinê de jan û êşên giran jî çêdibin, her wekî dîrok ji van miştin û mînak anîn ne lazim e... Wekî tê zanîn, îro gelê kurd bi qeweta şervanên xwe amade ye ku kirasê bêrûmetiyê biqetîne, qirêj û zingara bi salan bavêje.

Gelê kurd bi serokatiya xwe ya rast û dirust, bi ramana xwe ya rast û bi gotin û xebata xwe ya rast, bi awayekî bêpêşlênayêgirtin ber bi serxwebûn û azadiyê ve diçe. Birûskên azadiyê, yên ku ji serê Cudî, Herkor, Agirî, Tendurek, Zaxros, Gabar û Nurhaqê vedidin, ne tenê Kurdistanê ronî dikin. Wê gelên Rojhilata Navîn tev pê azad û ronahî bibin. Îro em dibînin du beş kurd dorekê (rol) dilîzin, yek bi binê perdeya olê, ya din di bin perdeya çeptiyê de bi vî awayî xwe ji şerê azadiyê dûr dixin.

Yanê minafiqiyê dikin. Kêngê be wê di nav rastiya gelê kurd de bihelin, herin. Lê wê siba tu av û sabûn, pintîtî û bêrûmetiya wan paqij neke. Lewre îro di vî şerê herî dijwar de kesê kurdan ji hev perçe û belav bike bêîman, bêrûmet û bêwijdan e.

Bêkon Pojan
M.Ali /Munih



JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

Guherînên nû

Welatê Me bi vê hejmara xwe dibe 33 hejmar. Ew, digel van şertên dijwar, 32 hejmar birêkûpek derket. Hejmara 33. ji ber pirsgirêkên teknîk û hwd. heftiyekê bi derengî derket. Ji bo ku careke din dereng dernekeve, me hin tedbîr standin. Dîsa jî em ji ber vê derengmayina hefteyekê, lêborînê ji xwendevanên xwe dixwazin.

Ji hejmara 34. ve hûnê rastî hinek guherînan bên di rojnameyê de. Hem ji aliyê şekil û naverokê ve, hem ji aliyê awayê belavkirinê ve û hem jî ji aliyê kadro ve. Hin ji van guherînan ji ber daxwazên xwendevanan, hin ji wan jî ji ber şertên dijwar pêk tên.

Piraniya xwendevanên me dixwazin ku em zêdetir cih bidin nivîsên li ser çand, hûner û zimên û cihê ji bo nûçeyan hindiktir bikin. Wekî din xwendevan dixwazin ku em bi kaxezên qalîtetir rojnameyê derînin û wêneyan zêdetir bikin. Ji xeynî firotina rojnameyê li cem bayiyan, bi destan belavkirina wê jî di nav daxwazan de ye, ji bo ku rojname bigihe hemû deveran.

Emê hewl bidin ku gav bi gav van daxwazan hemû bînin cih, lê dîsa jî daxwaza me ji xwendevanên ku heta niha rojname ji bayiyan distandin ev e ku dîsa wê ji bayiyan bistînin. Ew kesên ku derfeta wan tune ji bayiyan bistînin, wê bi belavkirina bi destan rojnameyê peyde bikin.

Em werin ser guherînên kadroyan. Wekî ku tê zanîn şertên xebata rojnamegeriya kurdan pir dijwar in. Dewlet bi awa û metodên hovane û resmî rê li ber çapemeniya kurdî digire. Ji ber wê yekê çapemeniya kurdan ji her kesî zehftir serî li guherîna kadroyan dide. hin ji rojnamegerên kurd têne kuştin, hin têne girtin, hin têne cezakirin û hwd. Li hemberî vê yekê çapemeniya kurdan mecbûr e li gorî van şertên dijwar tedbîran bistîne û li paş nekeve. Yek ji van tedbîran jî bêguman gihîştandin û bicihkirina kadroyên nû ye.

Heta niha gelek xebatkarên me jî rastî van rêlibergirtinên dewletê hatine. Bi taybetî di van mehên dawî de êrîşên dewletê yên cur bi cur zêdebûn. Gelek belavkarên rojnameyê hatin binçavkirin, tehdîtkirin û îşkencekirin. Li aliyê din der barê rojnameyê de DGM jî dozan vedike û cezayan li gorî dilê xwe dide berpirsên Welatê Me. Mesela di destpêka meha pûşperê de hevalê me Mehmet Gemsiz dema li DGM'ê parastina xwe bi kurdî kir, ji ber axaftina bi kurdî hate girtin û hê jî di girtîgiha Bayrampaşayê de ye. Ji bo xurtkirina naveroka rojnameyê me hin xebatkarên din di rojnameyê de bicihkirin.

Ji hejmara 34. ve ezê jî nikaribim Berpirsiya Giştî bidomînim. Ji neçarî ezê karê xwe dewrî heyeta weşanê bikim. Min pir dixwest ku ez vî karî demeke dirêjtir bidomînim, bes cezayê min ê ku ji ber berpirsiya nivîsaran ya rojnameya Welat, li min hatibû birîn, li Dadgeha Bilind a Tirk hate tesdîqkirin. Ji bo ku Welatê Me ji ber vê rewşa min zerarê nebîne, ez neçar im wezîfeya xwe dispêrim hevalên din ên hêja.

Di quncikê "Ji Welatê Me" de evê nivîsa min a dawî be. Tevî vê yekê ez bi temamî dev ji Welatê Me bernadim. Ezê fîîlî û resmî ji neçarî jê veqetim, lê dîsa jî bi nivîsên xwe yên cur bi cur, an jî çi ji min bê xwestin, ezê ji derve be jî, piştgiriyê bidim Welatê Me.

Welat û Welatê Me ji bo me xebatkar û xwendevanan tevan dibistan û akademî bûn û Welatê Me hê jî vê rola xwe bihêztir didomîne. Ji ber vê yekê keda ji bo Welatê Me deyn û peywirek e ji bo me. Ji bo her û her bipêşvebirina rojnamegeriya kurdî ya nûjen çi ji destê me bê, emê ji Welatê Me re bikin. Xebata ji bo Welatê Me keda di riya avakirina welatê me yê azad û serbixwe de ye jî.

Jiyana bi kurdî

Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat, berî çend rojan biryarek stand. Ev biryar ji aliyê rêveberiya wezareta çandê ve hate daxuyandin. Birêvebir M. Öztürk got ku divê di sala 1995'an de mirovê kurd bi kurdî bipeyive, bifikire, binivîse.

Em birêvebir û endamên NÇM'yê, bi can û dil ji vê biryarê re dibin piştgir. Em vê biryarê silav dikin.

Pirsgirêka zimanê kurdî girêdayî dagirkeriyê ye. Tê zanîn ku welatê kurdan xaka kurdan, hemû dewlemendiyên sererd û binerdê wan ji aliyê çar dewletê dagirker ve tên talankirin. Kesên ku vê dagirkeriyê dikin, ziman, çand, huner, tore bi kurtasî mirov dikare bibêje mêjî û dilê kurdan jî qeyd kirine. Gelekî ku bi salan jiyana wî hatiye qedexekirin, mêjiyê wî hatiye şûştin, qey dikare di nava salekê de ji vê birîndariya xedar rizgar bibe? Na, çareserkirina vê pirsgirêka pir girîng incax bi avakirina rêxistin û saziyên neteweyî mumkûn e.

Dema ku îro em li Kurdistanê û Tirkiyeyê dinêrin, dibînin ku hejmara rêxistin û saziyên neteweyî pir kêm e. Ji ber vê sedemê bi rastî di vê derbarê de xebatkarên NÇM'yê bi piranî kesên ku ji biçûkatiya xwe ve li metrepolan mezin bûne, ne. Ev kes asîmîle bûne. Her çiqas dê û bavê wan bi kurdî biaxivin jî, li dibistanan, li kolanan bi hevalên xwe re bi tirkî diaxivin. Êdî ev kes ne tirk in, ne jî kurd. Aliyekî mêjiyê wan bi axaftinên kurdî tije ye, aliyê din bi yên tirkî. De were ji nav vî karî derkeve. Dema ku dixwazin ji bavê xwe re bêjin: "Were nan bixwe," wisa dibêjin: "Baba were xwarinê yemîş bike." Carinan jî ji hevalê xwe re dibêjin: "Tu çiqas duşuncesiz î. Tu mi hîç anlamîş nakî."

Kengî ku me xewnê xwe bi kurdî dîtin, bi kurdî me henek kirin, me ji bavê xwe re got: "Bavo" û bi wê gotina şêrîn me got "dayê", wê demê em dikarin bibêjin qirêja ku dagirkerên tirk kiriye nav mêjiyê me, hatiye şûştin.

Û em zelal bûne, pak bûne, em bûne wekî gulokeke spî ya pembû...

Koma lêkolîna zimanê kurdî ya NÇM'ya Edeneyê

FERHENGOK

Akam: Bandor, hîkarî
Amadeyî: Lîse
Asayî: Normal
Baregeh: Kamp
Bedbext: Xerab, awan, nebaş
Bermayî: Tiştê ji ber maye
Berjewendî: Menfeet
Cemawer: Girse
Çolter: Cihê ji bajêr dûr (kırsal)
Dahatû: Paşeroj, atî (gelecek)
Derfet: Keys, firsend
Erk: Wezîfe, peywir
Geşedan: Bi pêş ve çûyîn, berfirehbûn
Gerdiş: Adet
Giyanewer: Rihber
Herêkirin: Tesdîqkirin
Jiyar: Debar
Kambaxî: Felaket
Melevanî: Soberî, avjenî, ajnebarî
Mukum: Bicihkirin
Nagehan: Ji nişka ve
Nameze: Bi taybetî
Niyaz: Niyet
Nûjdar: Hekîm, dixtor, bijîşk
Pêzanîn: Malûmat
Pîşeyî: Meslekî
Pûte: Îtibar
Qoleçan: Derdor kontrolkirin
Rewişt: Awayê jiyanê
Rihakirin: Rizgarkirin
Sext: Dijwar, zor, zehmetî
Surişt: Xweza
Sinc: Exlaq
Şademanî: Festîval
Şalyar: Wezîr
Tomarkirin: Qeydkirin, tescîlkirin
Yarî: Henek
Yeksane: Hevkêşe (denge)
Vederkirin: Tecrîtkirin
Xoşewîst: Kesê ku tê hezkirin
Ziyan: Zirar

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	Li Hundir	Li Derve
☐ 3 Meh	☐ 550.000 TL	☐ 45 DM
☐ 6 Meh	☐ 1.000.000 TL	☐ 80 DM
☐ 12 Meh	☐ 1.800.000 TL	☐ 150 DM

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkiyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

NAV Û PAŞNAV : .....
NAVNÎŞAN : .....
.....

Navnîşana Welatê Me
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel–Fax: 293 53 19 – 293 53 20

WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
Aynur BOZKURT

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
Mazhar GÜNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)
Metin AKSOY

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
Suut KILIÇ

Redaktor
Sami TAN

NAVNÎŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL–FAX
293 53 19 – 293 53 20

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÛNERÎ
(Temsilcilikler)

Suriye– Jan Dost
Fener Rojbiyanî
Berlin– Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
Hannover– Selîm Biçûk
49-5721-813 60
Hamburg– A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
Munchen– Mahmut Gergerli
49-871-670 884
Badenwurttenberg–
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
Amsterdam– Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
Parîs– M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
Atîna– Ferhan Zêbarî
30-13634905
Bruksel– Medenî Ferho
32-16-49 07 67

www.arkivakurdi.org

De gidî mişko, ha gidî mişko

Heke tişteki jahrîn li nava kanalizasyonê bê danîn, di nava çend saetan de ev nûçe li nav mişkan belav dibe û mişkek jî nêzî wê jahriyê nabe. Dema Kuriskarên seretayî dihatin bikaranîn, mişkan bi tenê genekî nû ji bo liberxwedanê diafirandin. Niha zanyar dibêjin ku mişk ji bo xweparastinê xwediyê navgînên têkûztir in. Mişk dema bi jehrîneke xurt û kompleks re rû bi rû man tişteki ku kîmyageran di dehsalan dikaribûn bi dest bixin, hilberandin. Wan derxist holê ku vîtamînê K wekî jahrşikên bikêr e. Niha ew xwe ji bandora jahrê bi riya heyberekî ku tê de vîtamînê K heye riha dikin.

Du heftiyan berî niha li Lyona Fransayê li ser mişkan civînek çêbû. Zanyarên ku beşdarî vê civînê bûn dan zanîn ku mişkan bi aqilmendiya xwe hewldanên ewrûpiyan yên ji bo jiholêrakirina wan pûç derxistine.

Michel Danselê ku yek ji wan zanyaran e wiha dibêje: "Sîstema zûpêhesîna mişkan tişteki awarte ye, ew zû serwext dibin û hev û din agahdar dikin." Danselê, ku navê "Mişk– Hevalên me yên ji Siyan" li pirtûka xwe ya dawîn kiriye, di vê pirtûkê de li ser awayê bîrbirin û tevgerîna mişkan disekine. Piştî xebateke 20 salan Dansel gihîştiye wê encamê ku mişk di nava heywanên bejî de piştî şenpanzeyan ji aliyê mejî ve rihberê herî bipêşketî ne. Dansel dibêje ku ji aliyê pîvanên klasîk ve, yanî ji aliyê giraniya mejî ve dema lê bê nihêrtin ev rastî dernakeve holê.

Li gorî Dansel, sîstema sînir a mişkan, kare xwe li gorî rewşên girîft saz bike. Wek mînak heke tişteki jahrîn li nava kanalizasyonê bê danîn, di nava çend saetan de ev nûçe li nav mişkan belav dibe û mişkek jî nêzî wê jahriyê nabe. Dema Kuriskarên serateyî hînî dihatin bikaranîn, mişkan bi tenê genekî nû ji bo liberxwedanê diafirandin. Niha zanyar dibêjin ku mişk ji bo xweparastinê xwediyê navgînên têkûztir in. Mişk dema bi jehrîneke xurt û kompleks re rû bi rû man tişteki ku kîmyageran di dehsalan dikaribûn bi dest bixin, hilberandin. Wan derxist holê ku vîtamînê K'ê wekî jahrşikên bikêr e. Niha ew xwe ji bandora jahrê bi riya heyberekî ku tê de vîtamînê K'ê heye, riha dikin.

Tiştê ku mirovan dixe nava tirsê ev e; mişk karin ezmonên xwe û tiştê ku hîn bûne derbasî nifşên nû bikin. Ezmonên ku mirov nikarin bi salan derbasî nifşên xwe yên nû bikin (ji ber ku mirov pir hêdî nifşên xwe yên nû diafirînin) mişk karin didemeke kin de wan derbasî nifşên nû biki. Mişkek di sêmehiya xwe de ji aliyê zayendî ve dibe heywaneke gihîştî. Ew kare 14 çêlikan bide. Di nava saleke baş de, ji famileyeke mişkan pêkan heye ku hezar çêlik çêbibin. 50 salên mişkan beramberî 700 salên mirovan e.

Li gorî Michel Rampaudê ku beytar e, di warê cihguherandinê de qabiliyeteke mişkan a taybet heye. Ew dibêje: "Mişk li hemberî tiştên nû zehf fedok in, dema êmekî nû dibînin, bi tenê gezeke biçûk lê dixin, tama wî hiltînin. Dema ew tişteki jahrîn be, hew xwe nêzî vî tiştî dikin û hemcinsê xwe jî agahdar dikin.

Li aliyê din ew bi hêsanî dikarin xwe hînî cêja tişteki nû bikin. Niha mişkên bajarî xwe hînî tama plastîkê kirine û jê enerjiyê distînin. Ew kabloyên telefon û kompîturan dikurisînin, bi vî awayî jî bi milyonan dolar zerarê didine ewrûpiyan. Hêjmara wan ku her roj zêde dibe, ewrûpiyan ditirsîne. Bi xêra nermbûna zivistana Ewrûpayê û bermayiyên dikanên fast–food'ê, ew bi hêsanî debara xwe dikin. Li Parîsê hejmara mişkan digihîje 6 milyonî, li Londonê jî ev hejmar 10 milyon e. Niha ewrûpî ji bo ku mişkan bixapînin li ser jehrînên nû dixebitin. Ji bo ku liberxwedana wan bişikênin li ser jahrîneke ku karibe piştî çend rojan wan bikuje, dixebitin.

Çavkanî: The European Magazine

Werger: SAMÎ BERBANG

www.arsivekurdi.org